## Dosya: Qewmê li pey azadî û zimanê xwe; amazîgh ango berberî

Serpêhatiya Cezayîrê ji me gelekan re ew ê nas û nêz were. Weke tê zanîn, li dinyayê gelek qewm û civak hene pir dişibin hev. Ew her çiqas ji hev dûr û di navbera wan de parzemîn, behr û çiya hebin jî xwedî gelek tiştên hevpar in ango dişibin hev... *Ardîn Dîren / R.12*



## Bîble/Kitêb



Bi nivîsa yekemîn merhebayekê pêşkêşî xebatkar û xwînerên rojnameya Xwebûnê dikim. Kurd, weke mirov, weke netewe, weke niştecih... *Yaqop Tilêrmenî /R.5*

## Sazûmaniya aboriya civakî



Tevgerek bi fikrekê dest pê dike; di nav civateke biçûk ango komekê de zîl dide; bi kar û xebatên wê ve can digire û di nav civata mezin de digivire... *Ahmed Pelda /R.7*


# xwebûn

**19-25 COTMEH 2020 HEJMAR: 44 BUHA: 4 TL *rojname@xwebun.org***


## Xwestin cenazeyan bidin

Rêxistinên hiqûq û civakî yên sivîl ên mîna Komeleya Mafê Mirovan (ÎHD), Komeleya Hiqûqnasên ji bo Azadiyê (OHD), Weqfa Lêkolînên Hiqûqî û Civakî (TOHAV), Komeleya Piştevanî, Yekitî û Çandê ya Alîkariya Kesên Xizmên Xwe di Dergûşa Şaristaniyan de Winda Kirine (MEBYA-DER), Komeleya Piştgirî û Piştevaniya Malbatên Xizmên xwe Winda Kirine ya Anatoliyê (AN-YAKAY-DER), Platforma Komeleyên Rojhilatê Başûr (DGDP) û Komeleya Elewiyên Demokratîk (DAD) ji bo cenazeyên ji goristana Xerzana Bedlîsê hatibûn derxistin û 282 ji wan li peyarêya goristana Kîlyosê hatibûn veşartin, werin derxistin li Otela Hîll a Taksîma Stenbolê civîna çapemeniyê li dar xistin. Di civînê de metna hevpar a hatibû amadekirin ji aliyê Seroka ÎHD'a Stenbolê Gulseren Yolerî ve hat xwendin. Di daxuyaniyê de hat xwestin ku cenaze radestî malbatan bên kirin û ji wan lêborîn bê xwestin... *R. 3*

## Çaxa Xelîfe Elî hat Tilelo

Me dabû dû şopa şewata Licê ya sala 1993'yan. Em vegeriyan Amedê û li Deriyê Çiyê ji otomobîla fiat peyabûn. Bi mamoste Amed Tîgrîs re me riya xwe bi Mizgefta Mezin xist. Amed Tîgrîs bi şaredariyê re kitêbek li ser bajarê Amedê amade kiribû. Yên dîtibin dizanin. Li hewşa Mizgefta Mezin a ji kevirê reş, saeta rojê heye. Me li wê saeta rojê meyze dikir. Di wê navê re, zilamek ku tayên spî ketibûn porê wî, bedil lê, bi gumlekê spî û girewat girêdayî, ji çend peyayên pê re der barê saeta rojê de wisa got: "Dema Xelîfe Elî hate Tilelo, saet li wir bû. Wî ev saet rakiriye û li wir daniye." Haya efendî jê tune bû ku nivîskarê kitêba Amedê bixwe li wir e. Amed Tîgrîs li zilam nêrî û jê pirsî: "Te got çi, te got çi!?" Zilamê bibedil û girewat, bi "şagirtên" xwe re wek pisîka ziyanan bike ji wir bizir (winda) bû. Li Kurdistanê dîroka perestgehan gelekî kevn e... *Seyîdxan Anter / R.8*



# 'Bêrû' rûyê wan ê rast nîşan da

Li Stenbolê qeymeqamtiyê lîstika şanoya bi kurdî ya bi navê 'Bêrû' qedexe kir û gelek kesan piştgirî dan şanogerên kurd. Bi qedexekirina lîstika kurdî rûyê wan ê rast careke din derket holê. Şanoger Çetoyê Zêdo têkildarî mijarê ji rojnameya me re axivî û destnîşan kir ku heta niha li Tirkiyeyê gelek lîstik hatine qedexekirin lê cara ewil e evqas dibe rojev... *R.11*

**SKEÇ**

### Hinek Henek dilê temaşevanan xweş û geş kir


***Çand û Huner / R.11***

**HEVPEYVÎN**

### Şêrko Kanîwar: Muzîk ne ji bo çîneke bijartî ye

***Hevpeyvîna Rizoyê Xerzî / R.4***

# Kurd dê rê nedin fermanên nû




Gelê êzidî ku heta niha bi gelek fermanan re rû bi rû maye, niha jî bi peymanan pêşî li fermanên nû tê vekirin. Di navbera Bexda û Hewlêrê de li gorî dilê dewleta tirk peymanek hat îmzekirin. Di serî de gelê Şengalê û gelek rêxistinên kurdan bertek nîşanî vê peymanê dan û gotin ku dê destûr nedin fermanên nû... *R.6*

## Sendroma Stockholmê

Li herêma Şengalê amadekariyên fermanek nû tên kirin. Her çiqas ev amadekarî wek hevkariya PDK'ê û rêveberiya hikûmeta navendî ya Bexdayê bên dîtin jî di cehwera xwe de ev plana qirkirina li ser herêmê tê ferzkirin, li gor perspektîf û daxwaza dewleta tirk e. Ev peymana korsan a di nabera PDK û Bexdayê de hatiye îmzekirin, bi hemû aliyên ve li dijî îradeya gelê herêmê ye. Di rastiyê de rêveberiya PDK'ê di asta sendroma Stockholmê de aşiqê neyarê gelê kurd e. Ji ber vê yekê, ji destpêkê ve bi dewlata tirk re di nav tekiliyeke germ de ye. Niha wisa diyar e ku li gor daxwaz û nêrîna aşiqê xwe, bi hikûmeta navendî ya Bexdayê re hevkariyê dike...

***Felemez Ulug / R.6***



## Siyaseta femînîst

Ne marîfeteke ji rêzê ye ku jinek bêyî rûkeniya xwe, sekna xwe ya çeleng û zerafeta xwe ya femînen winda bike, bi stîl û şahab bersiva zilamekî -di pozbilindî û kuşpenetiya xwe de xeniqî- bide. Tê gotin, polîtîka hunera birêveberinê ye. Serdana Wezîra Karê Derve ya Swêdê Ann Linde...

***Munewer Azîzoglu Bazan / R.2***

## Ji her demê bi hêztir û bi biryar

Mêrê serdest ku di serî de jin, xwe wek xwediyê gerdûnê dibîne û di her serdemê de êrîşê hemû nirxên jinan kiriye. Hewl daye bi van êrîşan serî li jinan bide tewandin û rêxistinbûna jinan belav bike. Mêrê serdest bi taybetî êrîşê jinên rêxistinkirî kiriye; jinên ku hay jê rastiyên wan heye. Ji ber ku jinên birêxistinkirî ji bo pergala xwe xeter dîtiye û bi êrîşên xwe yên hovane xwestiye vê rêxistinbûnê belav bike û bi temamî bike bin kontrola xwe. Pergala heyî bi taybetî bi qasî ku di vê serdemê de li her qadê bi awayekî aşkera êrîşê jinan kiriye, di tu serdemê de ewqas êrîş nekiriye. Mêrê serdest ji Kurdistanê bigire heta welatên Rojhilata Navîn, Amerîka, Awûstralyayê û ji wir jî heta Afrîka û Asyayê êrîşên xwe yên hovane zêdetir kirin... *R.2*

## Adem bê ti kî nê meyweyî ra biwere

Adem xapîya. Ame ey kî ê meyweyî dare ra tam kerd, werd. Se ke werd tacê serî sere ra pera ra şî. Hêq û teala cira hêrs bî. Adem çêberê tobî ra, gina çêberê ramê ra, Govelêke çêberê nalêtî ra, verê çêberê xişmî ra, ezî kî tey, çêberê qêday ra eyştîme teber. Ma pêro pîya cayê xo ra bîme. Nika kî xo rê nê cayê de mekanê Xizir Nebîyî der o. Îta xo rê pînîme. Teyra Tawse ke nîya vat. Qesê xo xelesna. O wext Xizir Nebî... *Mehmet Seyîtalîoglu /R.9*

# Ji her demê bihêztir û bibiryar

Navenda Nûçeyan

Mêrê serdest ku di serî de jinan, xwe wek xwediyê gerdûnê dibîne, di her serdemê de êrîşê hemû nirxên jinan kiriye. Hewl daye bi van êrîşan serî li jinan bide tewandin û rêxistinbûna jinan belav bike. Mêrê serdest bi taybetî êrîşê jinên birêxistinkirî kiriye; jinên ku hay ji rastiyên wan heye. Ji ber ku jinên birêxistinkirî ji bo pergala xwe xetere dîtiye û bi êrîşên xwe yên hovane xwestiye vê rêxistinbûnê belav bike û bi temamî bike bin kontrola xwe.

Pergala heyî bi taybetî bi qasî ku di vê serdemê de li her qadê bi awayekî aşkera êrîşê jinan dike, di tu serdemê de ewqas êrîş nekiriye. Di roja me ya îro de, ji Kurdistanê heta Rojhilata Navîn, Amerîka, Awûstralya, Afrîka û heta Asyayê, mêrê serdest asta êrîşên xwe yên hovane li dijî jinan bêyî ku veşêre yan jî hincetan nîşan bide bilind kiriye.

Berovajiyê vê yekê, di vê serdemê de bi qasî ku berxwedan, têkoşîn û rêxistinbûna jinan li dijî pergala heyî derket asteke jor di tu serdemê de jî evqas bilind nebûbû. Bi qasî ku jin di vê serdemê de tên gel hev, xwe birêxistin dikin û dengê xwe li polîtîkayên li dijî xwe bilind dikin, di tu serdemê de ev tişt nehatibû kirin.

Bi taybetî herî zêde di serî de jinên Kurdistanê, jinên ku di nav şerê mêrê serdest ê ji bo berjewendiyên xwe daye destpêkirin de dijîn, li ber xwe didin û xwe birêxistin dikin. Ev jinên ku di nav şerê desthilatdariyê de hewl didin xwe, jinan û civaka xwe biparêzin û her wiha birêxistin bikin; bi avakirina platform, înîsiyatîf, koordînasyonan û bi destpêkirina pêngavan dixwazin hemû jinan bînin ba hev û xwe bigihînin hemû jinên cîhanê.

Em dikarin bi du mînakan rêxistinbûna jinan nîşan bidin. Yek ji vana pêngava TJA'yê ye ku beriya mehekê hatibû destpêkirin û ya din jî înîsiyatîfa ku ji aliyê jinên bakur û rojhilatê Sûriyeyê ve hat destpêkirin û di vê înîsiyatîfê de jinên ji Iraq, Libnan, Misir, Tunus û Lîbyayê hene.

**Pêngava TJA'yê**

Tevgera Jinên Azad (TJA) beriya mehekê li dijî tacîz, tecawiz, destdirêjî, qeyûm, tecrîd, talankirina xwezayê û her cureyên êrîşên li ser jinan pêngava 'Em Xwe Biparêzin' ji bo 4 mehan da destpêkirin. Jinên TJA'yê di çarçoveya vê pêngavê de gelek çalakî pêk anîn; bi jinan re hatin gel hev û der barê pêngava xwe de jinan û civakê agahdarkirin. TJA dixwaze bi vê pêngava xwe hemû jinên Kurdistanê ji tacîz û tecawizê, li dijî her cureyên polîtîkayên desthilatdariyê biparêzin. Wekî ji navê pêngavê jî tê fêmkirin, jin hêviya xwe bi pergal û qanûna wê girê nadin; dixwazin bi vê pêngava xwe peyamê bidin jinan ku hêz jî hêvî jî ew bi xwe ne; ne pergala ku bi hezar salan e êrîşî nirxên wan dike.

TJA bi vê pêngava xwe dixwaze jinên ciwan û civakê li dijî polîtîkaya şerê taybet ku bi salan e bi destê desthilatdariyê li Kurdistanê tê meşandin, agahdar û birêxistin bike. Heta niha pêngava TJA'yê rastî eleqeyeke baş hatiye lê divê ji 7 salî heta 70 saliyan di serî de jin hemû civak xwe tev li vê pêngavê bike û erka ku dikeve ser milê xwe pêk bîne.

**Înîsiyatîfa jinan**

Înîsiyatîfa ku rêxistinên jinan ên bakur û rojhilatê Sûriyeyê jî di nav de, beriya çend hefteyan bi dirûşma 'Ji bo ewlekarî û aştiyê, li dijî dagirkirin û qetilkirina jinan têkoşîn' bi hevkariya jinên Iraq, Libnan, Misir, Tunis û Lîbyayê hate avakirin.

Jin di daxuyaniya xwe de diyarkiribûn ku pergala kapîtalîst li ser kaos, şer û krîzan emrê xwe dirêj dike û destnîşan kiribûn ku zêdebûna tundiya li ser jinan bi zanebûn e û yek ji polîtîkayên herî girîng ên pergala kapîtalîst e.

Jinan diyar kiribû ku ji ber bêdengiya saziyên navneteweyî binpêkirin zêdetir dibin û ev tişt gotibûn: "Di şerê li herêmê de çand, siyaset, raman û di warê tenduristiyê de piranî jin tên hedefgirtin. Li Sûriyeyê qetilkirina Sekretera Partiya Pêşverû ya Sûriyeyê Hevrîn Xelef û yên li gel, endama Koordînasyona Kongreya Star Zehra Berkel û hevalên wê, li Iraqê li çiyayê Şengalê êzidî Dunya Hesen, li Silopyayê qetilkirina endama meclisa HDP'ê Sêvê Demîr û hevalên wê, li Filistînê Semah Mubarek û li Lîbyayê Selwa Bûgîgîs bi van polîtîkayan hatin hedefgirtin û qetilkirin."

**Cuda lê wekî bedenekê**

Ev her du bûyerên ku me wek mînak nîşan dan, bi me dan nîşandan ku çareseriya her tiştî jin bixwe ne. Rizgariya jinan û civakê bi rêxistinbûna jinan ve girêdayî ye. Divê tu jinên cîhanê ji bîr nekin ku serkeftin encax bi hevgirtin û birêxistinbûnê pêkan e. Çawa hebûna mêrê serdest girêdayî parastina pergalê ye, divê hemû jinên cîhanê û civakên ku ji aliyê pergalê ve tên eciqandin jî bizanibin, hebûna wan jî girêdayî rêxistinbûnê ye.

Divê hemû rêxistinên jinan ên cîhanê bên gel hev û her tim di nav têkiliyê de bin. Divê rêxistinên jinan li gorî şert û mercên civaka xwe, cuda cuda xwe birêxistin bikin lê her tim wek bedenekê tevbigerin; yanî ji di her demê de bêhtir hêz û biryar divê.











Biyan

Munewer Azîzoglu Bazan

## Siyaseta femînîst

Ne marîfeteke ji rêzê ye ku jinek bêyî rûkeniya xwe, sekna xwe ya çeleng û zerafeta xwe ya femînen winda bike, bi stîl û şahab bersiva zilamekî -di pozbilindî û kuşpenetiya xwe de xeniqî - bide. Tê gotin, polîtîka hunera birêveberiyê ye. Ev huner di destên hinekan de dibe amûra qeşmeriyê, di yên hinekan de dibe ya estetîkê.

Serdana Wezîra Karê Derve ya Swêdê Ann Linde û daxuyaniya wê ya bi Wezîrê Karê Derve yê Tirkiyeyê Mevlut Çavuşoglu re wek mînakên her du awayên polîtîkayê derketin pêşberî me. Çawa nêzîkatiya Çavuşoglu di heman demê de nêzîkatiya dewleta Tirkiyeyê û fêmkirina wî ya polîtîkayê dide der, numayîşa Ann Linde ya bi xwe bawer û serbilind jî helwesta wezareta wê û fêmkirina wê ya polîtîkayê destnîşan dike.

Welatên bakurê Ewropayê tê zanîn ev demeke dirêj e, di mijara wekheviya zayendan de û temsîliyeta jinan a di nav hemû qadên jiyanê de wek mînakên erênî tên dîtin. Li welatên Skandînavyayê hem di nav polîtîkayê de û hem jî di nav karûbarên aboriyê û rêveberiya her du milan de jin xwedî temsîliyeteke bilind in. Heta di hin qadan de temsîliyeta jinan ji ya mêran zêdetir e. Sedemên vê pêşketinê di hewldanên rêxistinên jin û femînîstan û tekoşîna wan a bi dehan salan de veşartî ne. Her wiha ev pêşketin bi hin gavên pratîk ên ji hêla hikûmetan ve bi awayekî şênber ketiye meriyetê. Ji salên 1970'yî vir de li Swêdê wek mînak mêr dikarin ji bo xwedîkirina pitikê destûra dêûbavê ji cihên kar bigirin û li zarokên xwe binêrin. Her wiha alîkariya ji bo zarokan ji mêj ve ye li welatên skandînavî hene. Bi vî awayî jî jinên bakurî li gorî welatên din ên ewropayî di warê polîtîka, rêveberî, pîşe û aboriyê de xuyatir in. Bi amûrên wekî 'kota'yê mijara wekheviya zayendan li hemû qadên dewletê li dijî dilxwaziya mêrê serdest û rûspî bû mecbûriyet. Bi vê rêbazê di temsîliyeta jinan û polîtîkaya pratîk de gavên li gorî berjewendiya jinan zêdetir hatin avêtin. Mixabin ligel vê pêşketinê li bakurê Ewropayê ne şîdeta li ser jinan, ne zayendperestî û ne jî newekheviya navbera zayendan a civakî xelas bû.

Ev kambaxên hanê hîn li wan deran jî wekî seranserê cîhanê xwe didin jiyîn. Nexwe di vê mijarê de awayên hûrbûnê û cudahiyên wan derdikevin pêşberî me. Lewre di nav pergala heyî de li dijî newekheviya zayendan têkoşiyan tiştekî ye, li dijî sedemên newekheviya zayendan têkoşiyan tiştekî din e. Yek jê wek mînak, ji bo jin di nav aboriya kapîtalîst de bên xuyakirin têdikoşe, ya din li dijî aboriya kapîtalîst wek sedema bingehîn a newekheviya zayendan têdokişe lê bila ev cudabûn di çarçoveya vê nivîsê de serê me tevlihev neke. Lewre bi çi awayî dibe bila bibe ji bo têkoşerên her du qadan jî Çavuşoglu kesekî nayê tehemûlkirin.

Ya Ann Linde jî di serdana wê ya Tirkiyeyê de û di hunera polîtîkayê de bi hêz, estetîk û balkêş dike, ew ruhê wê yê kevneşopiya têkoşîna jinan e. Di ser de Swêd di cîhanê de yekemîn û yekane welat e ku xwedî polîtîkayeke femînîst a karê wezareta derve ye. Ji sala 2014'an vir ve nêrîneke zayendî ya sîstematîk dixin rojeva xwe ya siyaseta derve. Armanca sereke ya sîyaseta femînîst a derve parastina wekheviya zayendan avakirin û mafên keç û jinan wekî mafên bingehîn a mirovan li seranserê cîhanê ye. Wezareta Karê Derve ya Swêdê di sala 2018'an de azmûn û serpêhatiyên xwe yên siyaseta femînîst a derve, wek çavkaniyeke bingehîn bi awayekî nivîskî çap kir. Têkoşîna li dijî şîdeta li ser jinê, nûnertiya jinan a di nav siyasetê de, mafê perwerdeyê çend mijarên ku tê de tên destgirtin in. Di vê çarçoveyê de 'wekheviya zayendan' ji bo gihiştina armancên wek 'aştî û ewlehiyê' bingehîn û jiyanî tê dîtin. Ev analîz di heman demê de analîza teoriya femînîst a bingehîn e. Newekheviya zayendan wek sedema hemû newekheviyan/nakokiyan dibîne. Siyaseta femînîst a Swêdê jî vê tespîtê wek referans digire û dixwaze li seranserê cîhanê di vê mijarê de berpirsiyarî û peywira xwe bîne cih.

Di vê helwestê de siyaseta femînîst a Swêdê (carinan li dijî daxwaza netewe-dewletê be jî) di kevneşopiya kolonyalîst a Ewropayê de gunehkariya xwe jî dibîne. Ev nakokî di gotina Ann Lîndeyê de jî xwe dide der: "Li dera ku çend kes dixwazin mafên nîvê nifûsa cîhanê bi sînor bikin, em tevgereke cîhanî -ya ji bo bihêzkirina jin û keçan û xwedîderketina mafên wan ên mirovî- temsîl dikin."

Ann Lînde wek pêşkêşvan û birêvebira siyaseta femînîst vê stratejiyê bi 4 R'yan pênase dike: Parastin û xurtkirina maf (Rights), nûnertî (Representation) û çavkaniyên (Resource) jin û keçan a li ser rastiya (Reality) ku ew tê de dijîn. Bi gotineke din mafê jinan wek mafê bingehîn ê mirovahiyê dibîne, di pêvajoyên biryardayînê de jinan wek aktorên sereke dibîne û ji bo wekheviya zayendan û mafên jinan peydakirin û pêşxistina çavkaniyan pêwîst dibîne. Beramberî vê şert û mercên cuda ku jin tê de dijîn li pêş çav digire.

Sekna Ann Lindeyê ya li hemberî van 4 R'yan bi taybetî di wêneyên bi nunerên HDP, Kaos GL û bi Weqfa Dînk re kişandiye de xwe nîşan dide. Hunera siyaseta wê di sekna wê ya bihurmet de veşarî ye.




# Bijîşkan weke terorîst dibîne

Navenda Nûçeyan

Li Tirkiyeyê hewldanên AKP-MHP'ê yên bêdengkirina dengên muxalîfan didomin. Desthilata AKP-MHP'ê piştî ku di mehên havînê de li gel hemû nerazîbûnan baroyên Tirkiyeyê parçe kirin, niha jî Yekitiya Bijîşkên Tirk (TTB) kirine hedefa xwe û dixwazin hin guhertinan li ser pêk bînin.

TTB yek ji rêxistinên bingehîn ên Tirkiyeyê ku bi salan e li dijî polîtîkayên şaş û ne rast ên desthilatan xwedî helwest e. Ji ber vê sedemê di hedefa AKP-MHP'ê de ye. Dema Tirkiyeyê di sala 2018'an de êrîş bir ser bajarê Efrînê yê rojavayê Kurdistanê, rêxistina ku destpêkê li dijî êrîşê derket û dengê xwe bilind kir TTB bû.

**Weke terorîst nîşan da**

Dîsa di pêvajoya vîrûsa koronayê de şaşî û kêmasiyên der barê pandemiyê de derxistin holê û polîtîkayên şaş ên hikûmetê yên di vê derbarê de rexne kirin. Herî dawî jî li dijî polîtîkayên hikûmetê yên tenduristiyê kampanyayek da destpêkirin û bal kişand ser zor û zehmetiyên ku di encama polîtîkayên hikûmetê de kedkarên tenduristiyê dibînin.

Ji ber van sedeman, destpêkê Serokê Giştî yê MHP'ê Dewlet Bahçelî, TTB kir hedef û xwest ku bê girtin. Dîsa xwest ku hemû endam û rêveberên wê bên cezakirin û girtin. Piştî hedefnîşandana Bahçelî, di nav hefteyê de serokkomarê tirk Recep Tayyîp Erdogan jî TTB kir hedef û rêveberiya wê weke terorîst nîşan da.

**Fermana guhertinê da**

Erdogan bi zimanekî nijadperest angaşt kir ku seroka TTB'ê Şebnem Korur Fîncanci terorîst e û ne hêjayî serokatiya TTB'yê ye. Piştî van sûcdariyên xwe yên ji rastiyê dûr, Erdogan fermana guhertina TTB'ê da. Ji bo guhertinê AKP dixwaze ku weke baroyan TTB parçe bike û peyva "tirk" ji navê derxe. Her wiha li bajarekî ne tenê odeyeke bijîşkan gelek ode bên avakirin.

**Armanca hedefgirtinê**

Bi vê yekê armanc ew e ku hêza muxalif a xurt a TTB'ê ya li dijî desthilata xwe bişikînin û heta radeyekê wê bikin bin kontrola xwe. Her wiha heman guhertin ango kontrolkirinê dixwazin li ser Yekitiya Odeyên Endezyar û Avahîsazên Tirk (TMMOB) û Dadgeha Destûra Bingehîn (AYM) jî pêk bînin.

Di serî de TTB û partiyên muxalefetê yên Tirkiyeyê, li dijî vê mudaxaleya AKP-MHP'ê ya li ser rêxistinên sivîl dertên û bertek nîşan didin.

# Rêxistinan xwest cenaze bên dayîn

**Rêxistinên hiqûqî û civakî, ji bo cenazeyên ku li peyarêyê hatibûn veşartin, li Stenbolê li hev civiyan û xwestin ku cenaze radestî malbatên wan bên kirin û ji wan lêborîn bê xwestin**

Navenda Nûçeyan

Rêxistinên hiqûq û civakî yên sivîl ên mîna Komeleya Mafê Mirovan (ÎHD), Komeleya Hiqûqnasên ji bo Azadiyê (OHD), Weqfa Lêkolînên Hiqûqî û Civakî (TOHAV), Komeleya Piştevanî, Yekitî û Çandê ya Alîkariya Kesên Xizmên Xwe di Dergûşa Şaristaniyan de Winda Kirine (MEBYA-DER), Komeleya Piştgirî û Piştevaniya Malbatên Xizmên xwe Winda Kirine ya Anatoliyê (AN-YAKAY-DER), Platforma Komeleyên Rojhilatê Başûr (DGDP) û Komeleya Elewiyên Demokratîk (DAD) ji bo cenazeyên ji goristana Xerzanê ya Bedlîsê hatibûn derxistin û 282 ji wan li peyarêya goristana Kîlyosê hatibûn veşartin werin derxistin, li Otela Hîll a Taksîma Stenbolê civîna çapemeniyê li dar xistin.

Nûnerên komele û rêxistinan, parlamenterên HDP'ê Hişyar Ozsoy, Huda Kaya, parlamenterê CHP'ê Sezgîn Tanrikûlû û hevserokên HDP'a Stenbolê Elîf Bûlût û Erdal Avci û gelek malbatên daxwaza cenazeyên xwe dikin, beşdarî civînê bûn. Di civînê de metna hevpar a hatibû amadekirin ji aliyê seroka Şaxa ÎHD'ê ya Stenbolê Gulseren Yolerî ve hat xwendin û behsa veşartina cenazeyan a li goristana Xerzanê hat kirin.

**Êrîşa li cenazeyan polîtîk e**

Yolerî diyar kir ku êrîşên li goristanê hatine kirin, bi armancên polîtîk in û wiha got: "Em ji bo wergirtina cenazeyan gelek caran hewl dan lê hewldanên me bê encam man. Her çiqas dozgeriyê ragihand ku dê cenaze radestî malbatan werin kirin jî pêk neanîn. Êrîş û bêhurmetiya li dijî cenazeyan dilê civakê êşandiye û neveşartina li gorî çand, bawerî û kevneşopiyên civakê li dijî hiqûqê ye."

**Daxwazên rêxistinan**

Daxwazên ku ji bo wergertina cenazeyên bi awayekî hevpar hatibûn amadekirin jî Yolerî wiha rêz kir:

"* Der barê hilweşandina goristana Xarzanê û veguhastina cenazeyan Komîsyona Lêkolînê ya Meclisê bê avakirin, lêpirsînên edlî û îdarî bên destpêkirin û berpirsiyar bên diyarkirin û cezakirin.

* Nasnameyên 282 cenazeyên ku ji goran hatine derxistin bên diyarkirin û radestî malbatên wan bên kirin.

* Cenazeyên ku nasnameyên wan nehatine diyarkirin û li peyarêyê hatine veşartin, ji aliyê pisporan ve bên derxistin û careke din li goristana Xarzanê bên veşartin.

* Ji ber veşartina cenazeyan a li peyarêyê ji malbatên wan lêborîn bê xwestin."





# Berê winda dikirin, niha jî îşkence dikin

Komeleya Piştevanî, Yekitî û Çandê ya Alîkariya Kesên Xizmên Xwe di Dergûşa Şaristaniyan de Winda Kirine (MEBYA-DER), der barê nedayîna cenazeyên HPG'iyan ên ku di demên cuda de jiyana xwe ji dest dane, li Amedê daxuyanî da çapemeniyê. Hevseroka MEBYA-DER'ê Yuksel Almas, di daxuyaniyê de diyar kir ku di salên 90'î cenazeyan winda dikirin niha jî îşkence li wan dikin.

# 'Daristanan dişewitînin qeleqol û qereqolan çê'

Navenda Nûçeyan

Operasyonên leşkerî yên di mehên bihar û havînê de hatibûn destpêkirin, di mehên payîzê de hatin zêdekirin û operasyonên nû hatin destpêkirin. Herî dawî wezareta karên hundir ragihand ku bi beşdariya 2 hezar leşker, polîs û cerdevanan li bejahiyên bajarên mîna Sêrt, Şirnex, Wan û Colemêrgê operasyonek berfireh a leşkerî hatiye destpêkirin.



Di van operasyonan de bi ser gelek gundên herêma operasyonê de tê girtin û gelek gundî tên binçavkirin. Her wiha bi van operasyonan re bi aweyekî zalimane xwezaya Kurdistanê jî tê talankirin; daristan tên şewitandin û destûr nayê dayîn ku şewata daristanan bi rojan bê vemirandin. Ev jî dibe sedem ku bi sed hezaran dar bişewitin.

**'Xwezaparêzî tune ye'**

Ne tenê li bakurê Kurdistanê li gelek deverên Tirkiyeyê jî ji aliyê hin derdoran ve daristan tên şewitandin û deverên gelek mezin ên bidaristan tên tunekirin. Herî dawî li Hatayê şewateke mezin derket û herêmeke mezin a daristanên Hatayê şewitî. Ev di nav raya giştî de bû sedema nîqaşan û hat angaştkirin ku ev şewat ji aliyê kesên dewlemend ve bi zanebûn hatiye derxistin.

Berdevkê Platforma Parastina Hewselê Vahap Işikli, der barê şewitandina daristanan û talankirina xwezayê de ji rojnameya me Xwebûnê re axivî û nirxandinên girîng kirin. Işikli ku bi xebatên parastina Hewselê dest bi xebatên xwe yên ekolojiyê kiriye, di destpêka axaftina xwe de da zanîn ku di civakê de hişmendiya xwezaparêziyê qels e û ew dixwazin hişmendiya xwezaparêziyê di nav gel de belav bikin.

**Komkujî pêk tînin**

Işikli diyar kir ku divê şewitandina darekê hemû mirovan biêşîne û di axaftina xwe de bal kişand ser şewitandina daristanên li bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê û wiha got: "Dixwazin komkujiya ku li geliyê Zîlan li ser mirovan pêk anîbûn, îro li ser xwezayê jî pêk bînin lê em li dijî vê politikayê disekinin û ji bo vê dixebitin. Em dixwazin bi xebatên xwe şewat û talankirina daristanan bikin rojevê û rê li ber bigirin."

Di berdewama axaftina xwe de Işikli, polîtîkayên dewletê yên der barê talankirina xwezaya herêmê de bi bîr xist û der barê mijarê de ev tişt anîn ziman: "Li Kurdistanê, li şûna daristanên tê şewitandin, niha qeleqol û qereqol tên çêkirin. Li bajarên Tirkiyeyê yên mîna Mûgla û Hatayê jî bi armanca ku otelên nû bidine çêkirin daristanan dişewitînin."

**Rapora talankirinê**

Der barê xebatên ku li dijî talankirina xwezayê dikin jî Işikli ev agahî parve kirin: "Em hewl didin xwe bigihînin her dera cîhanê; li ku dera cîhanê talan li ser xwezayê hebe em li dijî wê disekinin. Me bi Tevgera Ekolojiyê ya Mezopotamyayê re der barê şewata daristanan de di navbera salên 2010-2015'an de rapor amade kirin. Îsal jî em çûn gundên li herêma Cûdiyê, bendavên ku li Zîlanê tên çêkirin û Mûnzûrê."



Işikli di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser girîngiya xwezaparêziyê û ev tişt got: "Xebatên ekolojiyê ne tenê parastin e, her wiha teşhîrkirina pergala modernîteya kapîtalîst e, loma divê herkes xwe wek xwezaparêz bibîne û ji bo vê yekê bixebite. Em dixwazin, êrîşên li ser xwezaya Kurdistanê pêk tên, li aliyê Tirkiyeyê jî bên zanîn û bertek bên nîşandan."

## SLOGANA ME EV E: LI HER DERÊ Û JI BO HER KESÎ MUZÎK

# Muzîk ne ji bo çîneke bijartî ye

Rizoyê Xerzî

*Ma Muzîk Center di sala 2017'an de li Amedê hat vekirin û heta niha xebatên muzîkê dike. Di vê hejmarê de, me li ser xebatên Ma Mûzîkê bi koordînatorê wê Şêrko Kanîwar re hevpeyvîn kir.*



**Tu dikarî bi kurtî behsa xebatên we heta niha kirine bikî?**

Ma Mûzîk di 3'yê adara 2017'an de hat vekirin. Beriya Ma Muzîkê em wek perwerdekar di bin banê Konservatuara Aram Tîgran de dixebitîn. Konservatuara Aram Tîgran girêdayî Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê bû. Li wir gelek şagirtên me hebûn; me şagirtên xwe wek qursiyer perwerde dikirin. Li wir akademiya me ya ku me mamoste digihandin û akademiya me ya zarokan hebû. Piştî hemû saziyên kurdan hatin girtin, hewce bû ev perwerde nîvco nemîne û xebat bidomin.

Dema Ma Muzîk nû ava bûbû, tevî xwendevan û malbatan 400 kes hebûn. Ma Muzîk jî bi keda hemû xebatkarên vê derê xwe mezin kir. Wê demê wek tîmek tevî xebatkar, perwerdekar û şagirt em 50 kes bûn. Şagirtên me jî di vê pêvajoya avakirina vê derê de cih girtin. Digel şagirtan 400 malbatên me jî ji bo avakirina vê derê gelek piştgirî dan ku heta îro jî piştgiriya malbatan di vî warî de qet ji me kêm nebûye.

Ma muzîk berdewama karê me yê berê bû. Huner û bi taybetî muzîk, ne ji bo çîneke bijartî ye. Muzîk ji bo her kesî ye û divê her kes karibe xwe bigihîne muzîkê. Me ji vê felsefeya xwe ya perwerdeya muzîkê, bi taybetî em behsa muzîka kurdî ya li vî welatî dikin, sûd wergirt û ev sazî ava kir.

**Gelo temenekî destnîşankirî heye ji bo kesên bixwazin tev li vê perwerdeyê bibin?**

Li vê derê perwerdeya muzîkê berî zayînê dest pê dike. Dayikên ducanî beşdarî kursên me dibin. Piştî meha 4'an zarok di zikê diya xwe de pir aktîf dikare deng bibihîze. 4 malbatên me bi vî rengî hatin li vê derê perwerde dîtin. Ev parçeyek ji perwerdeyê ye.

Piştî wê perwerdeyek me ya ji bo 2-5 saliyan ku dê û bav jî beşdar dibin heye. Ev perwerde bi awayekî pîlot cara yekem sala 2014'an li 8 malên me yên dihatin Aram Tîgranê wek pîlot bi 8 zarokan dest pê kir. Em niha êdî dikin wek mîna navendeke taybet a 2 û 5 saliyan. Ev dibe wek dibistanekê. Me ji bo vê projeyê ji Ewropayê alîkarî wergirt. Dê û bavên wan jî beşdarî perwerdeyê dibin. Zarokên ji vir der diçin derbasî akademiya zarokan dibin an jî derbasî kursên Ma Muzîkê dibin.

**Heta niha çend şagirtên we li vir perwerde dîtine?**

Hema bêje di 6 salan de, tenê ji bo vê xebatê dibêjim, hejmara şagirtên Ma'yê yên 2-5 salî yên tev li vê xebatê dibin, her sal bi kêmanî 200 e. Tevahî hezar û 200-hezar û 500 zarok heta niha hatine Ma'yê. Li Ma Muzîkê ji destpêka vebûye heta niha zêdetirî 3 hezar kesan serî li me daye. Piştî ku ev merhelaya zarokên 2-5 salî temam dibe, zarok tên akademiya zarokan a temenê wan ji 6 salî heta 14 saliyan e... Derdê me li vir ev e: zarok wê dikaribin giraniya perwerdeya akademîk a muzikê hilbigirin an na; têgihiştina wan a muzîkê xurt e ne xurt e; wê dikaribin di muzîkê de bi pêş bikevin an na; em hewl didin vê bibînin û şûngirên xwe ava bikin. Em hewl didin ku ew bibin muzîkjenên muzîka kurdî, notîstên muzîka kurdî, xebatkarên muzîka kurdî... Loma jî di temenekî biçûk de, akademiya zarokan heye ku 6 salan didome. Piştî 6 salan zarok û malbat heke bi hev re bixwazin, îcar dikarin derbasî akademiya me ya nav hefteyê bibin. Niha di akademiya me ya zarokan de 140 zarok hene. Ji pola yekê heta 6'an.

Akademiya me ya mezin em dikarên bêjin, di dîroka Kurdistanê de yekem akademî ye ku li Aram Tîgranê dest pê kiriye. Di eslê xwe de akademî 10 salî ye; wek xebat, wek paşxane. Akademiya me ya nav hefteyê, li gorî bernameya hatiye danîn 4 an 5 roj in, 3 salan didome. Zimanê perwerdeyê ji sedî sed bi kurdî ye. Em hewl didin berhevkarên muzîka kurdî bigihînin ku di bin banê Ma Muzîkê de bîra muzîka kurdî wek beşekê heye. Tîmek me ya ji 12 kesan pêk tê heye ku ji gundan stranan berhev dike û notayên wan dinivîse û van tiştên hatine berhevkirin, deşîfrasyona wan dikin, notasyona wan amade dikin. Me 2 roj berê weşanên Ma Muzikê ava kir; êdî em pirtûkên xwe bi xwe amade dikin. Li ser navê weşana Ma'yê em ê çap bikin. (Notayên stranên kurdî)

**Girtina saziyên kurdan bandoreke çawa li xebatên we kir?**

Destpêkê, pêşbînî ew bû ku piştî hatina qeyûman ew ê xebatên me têk biçin, lawaz bibin û mirov bitirsin lê wisa nebû. Ev ne tenê ji bo Ma Mûzîkê, ji bo şano, sînemayê jî wisa bû; berevajiyê lawaziyê saziyên me yên çand û hunerê mezintir bûn. Dema em di bin banê şaredariyê de bûn, şagirtên me evqas tune bûn; têkiliyên me yên navneteweyî evqas ne xurt bûn. Ji ber ku her tim şaredaran û hinek heyetan hevdîtinên navneteweyî dikirin, me tenê karên pratîkî yên hunerê dikirin. Wek vîtrînekê bû, gelek caran di burokrasiyê de hinek tişt dixitimîn. Ez îdia dikim piştî qeyûman hemû xebatkarên çandê hêza xwe ya cewherî nas kir, baweriya a bi xwe zêdetir bû; dîtin ku dikarin çi bikin. Ji bo vê jî Ma Muzîk li gor 4 sal berê, li gor 10 sal berê pir mezintir, xurtir û berfirehtir e. Kalîteyek jî ava bû; êdî bila bi kurdî be, bila ji kevir be na lê êdî bi kurdî be lê bikalîte be.

> Destpêkê pêşbînî ew bû ku piştî hatina qeyûman, ew ê xebatên me têk biçin û mirov bitirsin lê wisa nebû. Berevajiyê lawaziyê saziyên me yên çand û hunerê mezintir bûn

**Zarokên bi ziman, çand û hunera xwe hînî muzîkê dibin, çi cudahiya wan ji zarokên bi zimanekî din hîn dibin heye?**

Dema mirov ji dayik dibe pêşî dibihîze, paşê diaxive. Mirovên bi zimanê xwe perwerde dibin, jixwebawerî, xweîfadekirin û aîdiyeta wan a çandê gelekî zêde ye. Îca heman tişt di muzîkê de jî heye. Heta girêdayî vê di felsefeya perwerdeyê de hinek metodên muzîkê derketine. Mesela Suzuki û Kodali hene; niha metodên wan tên bikaranîn. Ew jî wekî me dibêjin 'her giha li ser koka xwe şîn tê', gerek her zarok bi muzîka xwe ya gelêrî dest bi perwerdeya muzîkê bike; bi zimanê xwe yê zikmakî. Ji ber ku zimanê miletekî û zimanê muzîka miletekî heye. Ji bo vê jî dema ku zarok ji çanda xwe û bi zimanê xwe, bi kod û referansên çanda xwe, fêrî hunerê dibin, deriyê aîdiyetê li wan vedibin; teqez dema ku bi zimanê xwe perwerde dibin xwe aîd hîs dikin, xwe biyanî hîs nakin. Ji bo vê bi israr em bi zimanê zikmakî perwerdeya hunerê esas dibînin. Îcar girêdayî vê di kursan de em pirzimaniyê esas digirin. Bi zimanê erebî, îngilîzî jî heye lê ji sedî 85-90 bi kurdî em dersê didin.

**Tu wek mamosteyekî bi çi hestan dersê didî şagirtên xwe?**

Ez mamostetiyê ji zarokan fêr bûm; zarok mamosteyên min in. Ji ber ku her zarokek cihaneke pir cuda ye. Xebata min a yekem a zarokan bi 100 zarokan dest pê kir. 100 zarok, 100 cîhan, 200 heb çavên cuda li te dinêrin, 200 heb guhên cuda li te guhdarî dikin, tu mecbûrî ji hemûyan re yek bi yek bibî bersiv. Kelecana wê heye, tirsa wê heye; tu dibî bersiv an na? Piştî ku diqede dema tu hîs dikî vaye te xwe gihandiye giyanên wan zarokan, westandin nayê bîra te. Ez 10 saetan dikevim dersê. Dema ez derdikevim derve ji hêla fizîkî ve bi qasî serê derziyê westandinê hîs nakim. Ji ber ku ji hêla giyanî ve têr dibim. Perwerdeya min a bi taybetî bi zarokan re, ji hêla rûhî û fikrî ve min ewqasî têr dike wê kêliyê bi rastî jî ez nikarim bi gotinan pênase bikim.


**Tu dikarî ji kerema xwe re hinekî behsa xebatên we yên orkestrayê bikî?**

Slogana me ya esasî 'li her derê muzîk, ji bo her kesî muzîk' e. Divê muzîk li her derê be; dinya jî xera bibe, kevir li ser kevir nemîne jî divê muzîk li her derê hebe. Divê muzîk karibe xwe bigihîne her kesî. Li Ma Muzîkê 4 orkestra hene. 2 orkestrayên zarokan hene. Yek jê orkestraya rîtmên xwezayî ye ku ji alav û amûrên xwezayî pêk tê. Heta niha li Amedê, bi qasî 15 hezar zarok di vê orkestrayê cih girtine. Niha jî 140 zarokên Ma Muzikê di vê orkestrayê de ne. Îca orkestraya zarokan a profesyonel a akademîk heye. Zarokên akademiya zarokan di heman demê de li keman, sentûr, tar, sêtar, sêtêl, defê û hwd. dixin û distrên. Orkestraya zarokên Ma Muzîkê heye û orkestraya jinan heye ya tenê ji hevalên jin pêk tê. Navê wê jî orkestraya JinMa ye. Orkestraya JinMa ji aliyê hevalên jin ve tên birêvebirin. Her wiha orkestraya me ya mezin heye ya niha ji 25 kesan pêk tê. Orkestraya Ma Mûzîkê heye ya ji hemû endamên Ma Muzîkê yên muzîkjen pêk tê. Di repertuara orkestrayê de bi zaraveyên kurdî (kurmancî, kirmanckî, soranî) stranan hene.


Ji roja Ma Muzîk vebûye heya niha, em serî li projeyên Ewropayê didin ku piştgiriyê bidin me. Sala yekem ji Amsterdamê, mamoste hatin û li ser rêbazên perwerdeya fêrkirina muzîkê ji bo zarokan rawestiyan. Sala dinê, dîsa di asteke bilind de ji bo perwerdekarên me atolye hatin çêkirin. Projeya me ya sêyem jî me ji stranan pirek çêkir, bi kurdî (kurmancî, kirmanckî, soranî) ermenî û tirkî me ji her ziman û zaraveyekê 5 stranên zarokan ji nû ve çêkirin. Ev jî hatin ber çapê. Me hemû stranên wan qeyd kirin û me ew belav kirine. Projeya me ya îsal a niha didome 'ji lorîkan ber bi senfoniya rêwitiya newayan' di dawiya meha 11'an de pirtûka kemanê û pirtûka piyanoyê cara yekem di dîroka kurdî û cîhanê de ew ê hem melodiyên wan bi kurdî hem jî zimanê wan bi kurdî be û dê were çapkirin. Em metodan amade dikin. Enstîtuya Goethe ya Almanyayê, konsolosxaneyên Fransa, Swêd û Holandayê piştgiriyê didin vê projeyê.



### Şêrko Kanîwar kî ye?



Şêrko Kanîwar di sala 1981'ê de li gundê Girbelê yê Qosera Mêrdînê hatiye dinê. Di sala 2005'an de mamostetiya matematîkê qedandiye. Ji sala 2003'yan û vir ve, li Navenda Çand û Hunera Dîcle Firatê, Konservatuara Aram Tîgran wekî muzîkjen û perwerdekar xebitiye û niha li Ma Muzîk Centerê xebatên xwe didomîne



KitêbXaneya CAB

Yaqob Tilermenî

# Bîble/Kitêb

Piştî salên dirêj û piştî azmûneya nivîsandina qunciqnûsiya di rojnameya Azadiya Welat de bi nivîsa yekemîn merhebayekê pêşkêşî xebatkar û xwînerên rojnameya Xwebûnê dikim…

* * *

Kurd, weke mirov, weke netewe, weke niştecihên kurdistanî û weke mirovên xwedî kok û asasên ji Rojhilata Navîn du umran (temenan) di umrekî de bi cih dikin û bi vî awayî dijîn. Ji ber wê ye jiyîna ew qas êşan û jixwe kurd dibêjin, “Sed û yek sal jî derbas bibin, ew ê neguherin.”

Ev gotina ku teqabulî demdirêjiyê û serdestan dike, belkî ji bo mirovên diyalekperest ne gotineke pejirandinê be lê li aliyê dîtir weke neynika Lacanî ‘jiyîn’ li ber destê me ye û em jiyînan di teyisîna wê neynikê de jî darîçav dibînin. Jixwe her gotineke xweş, dîrhemeke reş (jehr) tê de heye. Ji lewre tam sed û yek sal derbas bûne û li ser parçeyekî erda me bi navê komarê welatek hatiye avakirin. Avakarên wê komarê ji hemû hebûnên me re gotine ‘xerabmal’ û ew hebûnên me birine, ji xwe re kirine ‘maldarî’. Me çi qasî xwestiye yên aydî xwe biparêzin jî, bi debûzekî serbizmarî bi serê me ketine. Di serê me qulikên xwînî çêkirine ku her û her xwîneke ziravik jê diherike û me ligel birînên xwe sedsalek li dû xwe hiştiye. Belkî jî ev be kurteya çîroka me, belkî jî ev be bîr û boçûnên me yên der barê XWEBÛNa me de.

Her çi qasî em li ser axa xwe bûne mişextî û ji bo avakirina bîrekê xwe dispêrin dexlê zimanê kurdî jî, neguherbar bi zext û zorên xwe dixwazin bi gomeyên mezin wê bîrê bimiçiqînin. Îcar em xwe li sînoran dixin û ligel rabirdûya xwe li derine dîtir niştecih dibin û ji qewlê Marcel Proustî ve “Jiyana me koçber (di)be jî, hişê me niştecih (dimîn)e”. Em ji nişkê ve serê xwe yê qulkirî, zanîna xwe ya derbxwarî, xwendinên xwe yên bi salan hildigirin û xwe li cihekî ewletir digirin ji bo ku bi dewlan avê li bîra xwe zêde bikin.

Em kurd bi du umrên di umrekî xwe de, li ser movikên pişta nîvmirovî hewl didin li ser du piyan rawestin. Ji ber wê ye deyaxkirina ew qas jiyînan.

* * *

Mirov bi çavên milkekî ku divê were parastin li zanînê fedike. Vê zanînê di quncikên malên xwe de ji ber çavên derveyîn vedişêre. Ji ber ku hemû gencîne û serhevdeyê mirovê xwedîzanîn, di vî qunciki de hefidandiye û em-mirov ji vê re dibêjin, kitêbxane (pirtûkxane).

Dema mirov hinekî bîra mirovatiyê tevlihev bide, pê dihese ku ev navlêkirin bixwe di wateya pîroziyekê de ye. Ev di zimanê kurdî de jî wiha ye û ji bo zimanên berbelav ên ewropî jî bi heman pênaseyê ye.


Di kurdî de ji pirtûkên pîroz re ‘kitêb’ tê gotin û ev gotin di sondxwarinên me de jî berbiçav in. Weke; “Bi çar kitêbên pîroz…” Cihê kitêb lê têne parastin jî, navê Kitêb+Xane’yê werdigirin: Cihên kitêbên pîroz û hemû cihên pirtûk lê têne komkirin, weke pîroziya wî/wê kesê ango wê saziyê tê hesibandin.

Îcar, di zimanên rojavayî de jî mînak di fransî de ji kitêbxaneyan re Bibliothèque tê gotin. Peyva ‘Bible’ di wateya pirtûka pîroz ‘Încîl’ (Mizgîn)ê tê bikaranîn. Di serdemên berê de cihê Mizgînê û kitêbên dîtir, dibûn bibliothèque. Jixwe peyva ‘Library’ a îngilîzî di wateya kitêbxaneyê de tê bikaranîn lê di zimanê fransî de bêtir ji bo kitêbfiroşan ev nav di zimên de ye.

Li welatê Swîsreyê û welatên dîtir ên Ewropayê digel bibliothèque û pirtûkfiroşan, di nav kolanan de kulûbeyên pirtûkan hene ku dişibin klûbeyên telefonan ên destpêkê. Mirovên ku dixwazin pirtûkan bi kesên dîtir re parve bikin, pirtûkên xwe datînin nav wan kulûbeyan û mirovên hewcedar jî wan ji xwe re bêpere distînin. Li kuçeyên nav taxan ji dêvla kulûbeyan, qutiyên li ser dîwaran hene û di wan de jî hejmarek baş pirtûk têne peydakirin. Min bixwe ji hin qutiyan pirtûkên çapên pêşîn peyda kirin ku li welatê me sehaf weke dektîfan li wan digerin. Weke pirtûkên Birayên Karamazovan, Biyanî, Kulîlkên Xirabiyê, Jiyanek… Biyaniya Albert Camus xwedî çapa salên 1940’î ye. Jixwe piştî ku mirov li welatê Swîsreyê çav li vê çanda parvekirinê dikeve, li ber keda xwe ya salan dikeve ku pirtûk berhev kirine ango di mala xwe de kitêbxane ava kiriye. Çinku min li Mêrdînê arşîveke dewlemend a pirtûk û kovaran li dû xwe hiştiye ku ji niha û pê ve xwegihandina min êdî ne pêkan e.

Pirtûk wiha ne û hewcedariya wan a parastinê di nav refikan de tune ye. Ew li mirovan digerin ku ji teref wan ve werin xwendin. Avakarê bîra zimanê kurdî Celadet Alî Bedirxan (CAB) jî bûye xwediyê bi sedan pirtûkan; kitêbxaneyek ava kiriye û ji wê fêde û mifayeke karîger wergirtiye ku pê hefizeya kurdî dewlementir bike. Îro sermiyanê xwendinên CAB weke xelekên zincîra zimanê kurdî gihîştiye me hemûyan; ew sermiyan di kitebxaneya wî de nemaye êdî. Tişta em ê lê bigerin, ew zanîna CAB a pêdiviya me pê heye, di nav pirtûkên kitêbxaneya wî de mane ku ji teref wî ve nehatibûn xwendin. Ji ber wê ye em ê xelekekê li zincîra zanîna wî zêde bikin û di nav pirtûkxaneya wî de bi pirtûkên NE-XWENDÎ re bigevizin.

Du umrên di umrekî kurdewariyê de bi cih bûyî, di serî de ji bo me pişt re jî ji bo çanda cîhanî wê xelekekê li mîrateya navneteweyî zêdetir bike. Ev jî ji hêvîkirinekê wirdetir e…



Amed Tigrîs

# Perwerdeya malê bingeha mirov e

Ez dixwazim li ser perwerdeyê rêzenivîsekê binivîsim. Ev rêzenivîs dê bi hevdu ve ne girêdayî bin lê di heman demê de hevdu temam bikin û wek domahîka hevdu bin. Her yek dê xaleke perwerdeya zanistî, wekhevî, neteweyî û demokratîk destnîşan bike; kêmasî û şaşiyên perwerdeya kevnare, teokratîk, paşvemayî û derzanistî jî rexne bike.

Ez dê bi perwerdeya malê dest bi rêzenivîsa xwe bikim; ji ber ku perwerdeya malê di jiyana zarokan de gava pêşîn û ya herî girîng û mayînde ye. Bi gotineke din mal di jiyana zarok de dibistana yekem e, dêûbav jî mamosteyên yekem û duyem in. Zarok li malê bi du rê û metodên cuda têdigîhêje; dest bi hînbûn û perwerdeyê dike. Rê û metoda yekem ev e ku ew bixwe, bi serê xwe derdora xwe dibîne, dibîhîse û têdigêhe. Ji vê rewşê re otohînbûn û otoperwerde tê gotin. Zarok bi çavên serê xwe wêne û dengên her kes û tiştên derdora xwe di hişê xwe de qeyd dike. Rê û metoda duyem jî zarok ji aliyê dê, bav û kesên malê ve tê fêrkirin û perwerdekirin. Zarok her ku mezin dibe zanîn û têgihîştina wî/wê jî dilop bi dilop zêde û kom dibin. Ew xwarin, vexwarin, rabûn, rûniştin, tevger, deng, lîstik, şahî, xemgînî, aramî û bêaramî, serûberî û bêserûberiyan dibîne û hîs dike. Wek tûtiyê deng û gotinan ji ber dike û di mejiyê xwe de qeyd dike. Roj bi roj gencîneya zanîn û bêjeyên zarok bêtir û xurtir dibin. Têkiliyên dê û bavî, xwişk û bira û endamên malbatê dişopîne û di bin bandora wan de dimîne. Piştre her ku mezin dibe derdora wî berfireh dibe. Herweha ji derî kesên malbatê heval û cîran jî li ser jiyan û kesayetiya zarok tesîr dikin.

Dê û bav li gor zanîn û baweriya xwe dest bi şîret û perwerdeyê dikin. Dixwazin zaroka wan jî ji aliyê zanîn, exlaq, bawerî û karakter ve wek wan be.

Çîrokên ku dê û bav an kal û pîr ji zarok re dibêjin an dixwînin di mejiyê zarok de zîl didin. Heta ku zarok bijî wan çîrokan ji bîr nakin.

Herweha niha di vê serdema me de înternet, telefon û televîzyon jî li wan alevên zanîn û perwerdeyê hatine zêdekirin. Divê dê û bav di vê mijarê de li zaroka xwe miqayet bin.

Zarok heta destpêka dibistanê li gorî rewşa malê ya olî, polîtîk, çandî gelek tiştan bi awayekî eşkera an veşarî hîn dibe. Di nav demê de tevna karakterê zarok dirust dibe û forma xwe digire. Ji derî hin îstîsnayan zarok êdî heta dawiya jiyana xwe li ser bingeha perwerdeya malbatî dijî. Dema mirov baş bala xwe bidê, dibîne ku zarokên malbatên pêşverû, aştîxwaz, demokrat li ser şopa malbata xwe û yên kevneparêz, tore perest û oldar jî li ser perwerde û şopa malbata xwe şîn dibin û dimeşin. Zarokên malbatên misilman, dibin misilman, yên xiristiyan, dibin xiristiyan, yên cihû, dibin cihû, yên êzidî, dibin êzidî, yên bûdîst, dibin bûdîst… Dema mezin dibin, ji dibistana seretayî heta zanîngehê dixwînin, dîrok û felsefeya olan hîn dibin, dîsa jî piraniya wan li ser ol, bawerî û exlaqê malbata xwe dimînin. Perwerdeya malbatî hewqas girîng û bi bandor e ku heta mirinê rola xwe dilîze û diparêze. Zarok wek hevîr e, mirov çawa bistire weha forma xwe digire. Li gorî pedagogan zaroka ku li malê heta 10-12 salan karakterê bigire, piştre êdî zû bi zû nahên guhertin.

Di nivîsa bê de, ez dê li ser rol û girîngiya xwendina bideng rawestim.

# Lêhûrbûnek li ser pirtûka ‘Bêyî Pêjna Te’

Mem Mîrxan

“Bêyî Pêjna Te” li serxet û binxetê lêgerîna azadiyê ye. Mirov ji kîjan kaniyê avê vexwe giyayê ber wê kaniyê ye. Ev serê 5 mehan e bi taybetî li ser helbesta kurdî mijûl dibim. Piştî xwendinên dûr û dirêj gihîştim vê encamê: Li bakur helbesta kurdî jî weke siya zimanê li ber asîmîlasyonê melûl e. Helbesta bakur tevî pêşketinên weşan, weşanxane û xwendevanan ji rê û rêçên "kurmanciya reş" dûr e lê Rizoyê Xerzî hem ji kaniyên bin xetê hem jî ji kaniyên serxetê av vexwariye. Peyv û ristên hûnandî sînorên mayînkirî derbas dikin û kirasên azadiyê yê gulgulî li xwe dikin.

***"Ey azadî ma ne bes e were***
***Di xewnan de têlên sînoran ne asteg in***
***Tenê were***
***Ê ne min got bila xewn be jî ez qayîlim***
***Ey azadî"***

Ev qîrîna ji dil rûpel bi rûpel li pirtûka Bêyî Pêjna Te belav bûye.

***"Bêyî te jiyan xewnereşkek bisaw e***
***Ziyayekî mar e***
***Xwe li gewriya mirov dibêçe"***

Rastî jî ew e, jiyana bêazadî ziyayekî mar e û xwe li gewriya mirov dipêçe.

***"Bêyî te***
***Karwanê jiyanê bêxwedî dimîne***
***Dê weledê xwe davêje***
***Zeriyên me zêmarên şînê li ser bûkên dest bi hine dixwînin***
***Bav darbestên kuran***
***Li ser milê xwe datînin***
***Xwazgîniyên te li hêviya hîrîna hespê te dimînin"***

Di helbesta bakur de di salên dawî de bi pêşengiya hinek helbestvanan, cûreyeke "helbesta tu kes tiştekî jê fêm nake, lê xweş e" bi pêş ket. Rizo neketiye wê dafikê. Helbesta wî famdar û herikbar e. Wendabûna hîrîna hespan a piştî 2000’î ya di helbesta bakur de rijîbûnek bêax, bêçand, bêerdnîgarî afirandiye. Rizo li ser pişta hespê azadiyê gav bi gav azadiyê û êşên bindestiyê dişopîne.

***Bêyî te***
***Xweza wêran e***
***Dengê şalûl û bilbilan ewtîn û reyan e***
***Heyva çardeşevî melûl û bêxwedan e***

***Bêyî te***
***Cîhan mîna gundekî binê beriyê***
***Bê dar û kanî ye...***


Rizo hemû mijarên miletê me pêve girêdayî di vê meşa li pey "Azadiyê" de kirine mijara helbesta xwe. Bi zarokekî koçber re li kêleka çadirekê, şîna dê û bavê li bin dara zeytûnê windakirî digire.

***"Hestê zarokekî koçber im***
***Yê dê û bav***
***Siya dara zeytûnê winda kiriye***
***Li kêleka çadirekê***
***Di bin tîrêjên tava dijwar de***
***Di bîranînan de dijîm"***

Rizo bi "simbilên şewitî yên axa Rojavaya talankirî re dilê me dikizirîne" bi "laşên şewitî yên Jêrzemênên Cizîra Botanê" re giyanê bêçaretiya me dişewitîne û bi "penaberên noqî deryayan bûne" re me weke termekî li peravên deryayan dixîne.

Pirtûka "BEYÎ PÊJNA TE" ya Rizoyê Xerzî hem bi berg hem bi rûpelsazî hem xêzên hundirîn ên şêwekar Luqman Ehmed, hem jî bi naveroka xwe wê di edebiyata kurdî de mayînde be.

Bêyî Pêjna Te, Weşanxaneya Belkî, 2020



# Metirsiya ‘birakujiyê’ didome

Navenda Nûçeyan

## Di 9'ê cotmehê de di navbera hikûmeta Iraq û Hewlerê de li ser Şengalê peyman hat îmzekirin û ev peyman rastî bertekan hat



Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) her ku diçe biratiya xwe û ya bi hikûmeta dewleta tirk re sexlemtir dike. Di gelek polîtîkayên dewleta tirk ên ku dixwest kurdan ji Rojava, Bradost heta Behdînan, Zînê Wertê û Maxmûrê derîne û deskeftiyên wan tune bike de, PDK li kêleka Hikûmeta tirk de cî girt. Bi vê yekê ve girêdayî bi dehan caran li ser deskeftiyên Rojava yê kete nav bazarê. Niha jî ji bo deskeftiyên Şengalê kete nav bazarê.

Wek tê zanîn PDK'ê 3'ê Tebaxa 2014'an ji ber êrişên DAÎŞ'ê û di Cotmeha 2017'an de jî ji ber êrişên artêşa Iraqê û Haşdî Şabî hêzên xwe ji herêmê vekişandibû. Di 9'ê Cotmeha 2020’an roja salvegera kompleya navnetewî de jî bi hikumeta navendî ya Iraqê re li ser Şengalê re peymaneke nû pêk anîn.

Ev peymana ku di navbera PDK û Serokwezîrê Îraqê Mustafa Kazimî de hatî çêkirin ji aliyê Êzidiyan ve weke ‘Firotina Şengel û Êzidiyan’, ‘Dewama Fermanê’ hat pênasekirin. Ev Peyman ji bo ku bêyî Îradeya kurdên êzidî bû rastî nerazîbûnên mezin hat.

Piştî ku Mûstafa Kazimî yê alîgirê DYE'yê li Iraqê bû desthilatdar û Fûad Hisên ê PDK'î bû Wezîrê Karên Derve, gava destpêkê ya têkildarî plana li dijî Şengalê hate avêtin. Alîkarê Wezîrê Destpêkê yê ji Rojhilata Nêz Berpirsyar ê DYE'yê Joey Hood meha Tebaxê di brîfîngekê de axivî. ji Hewlêr, Bexda û Enqereyê xwest ku "di bin şêwirmendiya DYE"yê de bi hev re bixebitin. Bi vê daxwazê re bal dikişand ser piştgiriya derve ya ji bo vê planê.

Di encamê de jî PDK'ê û hikumeta navendî ya Iraqê di 9'ê Cotmehê de di bin çavdêriya Nûnera Taybet a Neteweyên Yekbûyî (YE) ya ji bo Iraqê Jeannîne Hennîs-Plasschaert li ser Şengalê peymanek çêkirin. Di peymanê de ligel nedîtina îradeya Êzidiyan, hate ragihandin ku di mijarên ewlekarî, îdarî û ji nû ve avakirinê de li hev kirine.

Dema ku mirov bala xwe didin ser detayên peymanê hingî dibînin ku mijarên 'Pêşmerge wê venegerin Şengalê", "Qeymeqamê PDK'î wê wezîfeyê bike" û "Hikumdariya berê ya PDK'ê wê dewam neke" derdikevin pêş. Di xaleke peymanê de tê gotin, "Li Şengalê û derdora wê dê dawî li hebûna PKK'ê û hêzên ser bi wê ve bê anîn, wê destûr neyê dayin ku hêzên ser bi PKK'ê ti roleke xwe hebe". Ji vê xalê jî tê fêhmkirin ku nêta PDK'ê ji vegera li Şengalê bêhtir, dixwaze derbê li Êzidiyan bixe ku li herêmê bûye xwedî îrade.

## Hê jî bûyera 16’ê Cotmehê zelal nebûye!

Axa ku xwîna kurdên her çar parçeyên Kurdistanê li ser hate rijandin, di nav du rojan de radestî artêşa Iraqê hate kirin.

Heya niha jî bandora bûyerên 16’ê Cotmehê di warê coxrafî û bûyerên siyasî de li ser başûrê Kurdistan û cihê kurdan di nav Iraqê de maye.

Sê sal bi ser bûyerên 16’ê Cotmeha 2017’an re derbas dibe. Lê heya niha jî roj bi roj bandora van bûyeran xwe nû dikin. Êş û birînên wê rojê hîna di dilê gelê wan deveran û Kurdistanê bi giştî de maye.

Heya niha jî perde li ser hinek ji sirên vê bûyerê nehatine rakirin.

çi dema peywendiyên PDK û YNK’ê xerab dibin, vê bûyerê wek çekek bi bandor li dijî hev bikar tînin. Her du alî hevûdû bi ‘xiyanet’ û ‘firotinê’ tawanbar dikin.

Di 25’ê îlona 2017’an de li Başûr referanduma serxwebûnê pêk hat. Lê piştî pêkhatina referandûmê Irak, Tirkiye û Îran li dijî Başûr dest bi êrîş û ambargoyan kirin û piştî çend hefteyan di roja 16’ê Cotmehê de artêşa Iraqê êrîşî Kerkûkê kir. Di nava 24 saetan de tevayî deverên dikevin nava madeya 140 de xist bin kontrola xwe.

Bi vê êrîşê re ji sedî 51’ê xaka başûrê Kurdistanê ji destê îdareya Herêma Kurdistanê hate derxistin. Piraniya bîrên petrolê jî ketin destê Iraqê ku çavkaniya sereke ya dahatê bûn ji bo Herêma Kurdistanê. **SILÊMANÎ**



## ‘Bila Tirkiye hêzên xwe ji Sûriyeyê vekişîne’

Navenda Nûçeyan

Wezîra Derve ya Swêdê Ann Linde serdana Enqereyê kir û ligel Wezîrê Derveyê Tirkiyeyê Mevlut Çavuşoglu civiya. Linde di civînê de hişyarî da Çavuşoglu û ji Tirkiyeyê xwest ku ji Azerbaycan û Sûriyeyê vekişin û binpêkirina mafên welatiyên kurd rawestînin.

Ann Linde diyar kir ku hikûmeta AKP’ê şerên li Sûriyeyê, Lîbya û Qerebaxê gûr dike û bi domdarî serdestiya dewletên deryaya Spî binpê dike.

Linde bang li Tirkiyeyê kir ku hêzên xwe ji Sûriyeyê vekişîne û got ku Enqere ji parçebûna Sûriye û çewistandina li ser kurdên li wir berpirsyar e û her wiha nerazîbûna xwe nîşanî binpêkirinên hiqûqî û operasyonên qirkirinê yên li dijî welatiyên kurd ên li Tirkiyeyê jî da.

Wezîrê Derve yê Tirkiyeyê jî gefa wê yekê xwar ku ger Tirkiye hêzên xwe ji Idlibê vekişîne, zêdetirî 3 milyon penaberên Sûriyeyê dê berê xwe bidin welatên Ewropayê.

Derbarê rexneyên Wezîra Derve ya Swêdê de Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) Mezlûm Ebdî jî axivî û piştgirî da Ann Lînde û wiha got: “Em tevlî daxwaza Wezîra Derve ya Swêdê Ann Linde dibin. Derbarê şîroveyên li ser binpêkirinên Tirkiyeyê yên li bakur-rojhilatê Sûriyeyê rast dibînin û em piştgiriya daxwaza Swêdê dikin ku Tirkiye hêzên xwe ji Sûriyeyê vekişîne û li ser çareseriyeke siyasî bixebite ku rêzê li yekbûna axa Sûriye û cihêrengiya siyasî bigir.”



Xweşkanî

Felemez Ulug

## Sendroma Stockholmê û PDK

Li herêma Şengalê amadekariyên fermanek nû tên kirin. Her çiqas ev amadekarî wek hevkariya PDK’ê û rêvebiriya hikûmeta navendî ya Bexdayê bên dîtin jî di cehwera xwe de ev plana qirkirinê ya li ser herêmê tê ferzkirin li gor perspektîf û daxwaza dewleta tirk bi pêş dikeve.

Dema çeteyên DAIŞ’ê di 3’yê Tebaxa sala 2014’an êrîşî Şengalê kirin, di serî de civaka êzidî û gelê herêmê bi qirkirinê re rû bi rû ma. Di wê demê de qeymaqam û asayîşa Şengalê bi temamî di destê PDK’ê de bû. Tevî dizanîbûn ku li ser herêmê metirsiyek mezin heye jî ji bo parastina gelê êzidî tedbîrek baş negirtin. Lewma di encama wan êrîşan de bi hezaran keç û zarok bûn qurbaniyên fermana 73’an. Ji ber vê yekê gel dipirse; kesên ku wê demê nikarin Şengalê biparêzin çima niha xwe wek parazvan û xwediyê Şengalê dibînin? Ev kes li ser Şengalê xwedî çi planê ne?

Di nav van şeş salên derbasbûyî de ji gelê herêmê bigirin heya gelên cîhanê hemû kesî fermana li ser gelên Şengalê pêk hat bi wan dîmenên dema xelk ji Şengalê direve dîtin lê dîmenê ku gel aciz û hers kir jî dîmenên reva pêşmergayan bûn. Di cotmeha sala 2017’an de jî PDK’ê xwest derbasî herêma Şengalê bibe lê wê demê ji ber êrîşên artêşa Iraqê û Heşdî Şebî nediwêrî hêzên xwe rêke herêmê. Niha ji bo vê tehlûkeyê ji holê rake di nav tifaq û hevkariyek qirêj de tevdigere.

Bêguman ev peymana korsan a di nabera PDK û Bexdayê de hatiye îmzekirin bi hemû aliyên xwe ve li dijî îradeya gelê herêmê ye. Ji ber ku ev peyman hebûna pêkhateyên herêmê înkar dike û tine dihesibîne, ne mumkun e ku ji hêla gel ve bê qebûlkirin.

Pêwîst e mirov bi awayekî hîn werêktir bikaribe rexneya li rêvebiriya Herêma Kurdistanê û bi taybetî jî li PDK’ê bigire. Ji ber ku niha desthilatdariya herêmê bi giranî di destê wan de ye û ji aborî heya asayîşa herêmê ew xwe berpirisyar dibînin, pêwîst e ku muhatabê rexneyên gel jî ew bin lê dema mijar dibe rexne an jî hesap xwestin her tim PDK ji xwe re şirîka ava dike û sûc hemû davêje ser wan.

Ji ber rayedarên YNK’ê dibêjin haya me bi tu awayî ji vê peymana qirêj a li ser gelê herêmê tê ferzkirin nîn e, di halê heyî de PDK’ê ji xwe re hîn şirîkek peyda nekiriye. Ev partiya malbatî ya li ser dewlemendiyên Kurdistanê li gor berjewendiyên xwe tevdigere êdî hebûn û azadiya gelê kurd ji bo wan ewqas ne girîng e. Hemû bala wan li ser parastina desthilatdariya wan e. Lewma gel qir bûye, birçî maye, di bin êrîşan de ye zêde ne xema wan e.

PDK ji derveyî xwe kesî qebûl nake. Yanî PDK dixwaze li herêmê li gor dilê xwe rêveberiyek olîgarşîk ava bike. Bi vê yekê ve hebûna xwe ya li ser erkê jî daîmî bike.

Êrîşên li ser Şengalê jî parçeyekî vê planê ye. Ji hêla din ve PDK dixwaze kontrola sînorê di navbera rojava û başûrê Kurdistanê bi temamî têxe bin kontrola xwe. Ger rêveberiya Şengalê têxe destê xwe, wê bikaribe vê armanca xwe jî pêk bîne.

Gelo lihevkirina PDK û Bexdayê li ser Şengalê tenê ye ango heremên din ên bi madeya 140 tên pênasekirin hemûyan digire nav xwe. Li ser vê mijarê jî nêrîn û nirxandinên cuda hene ku dibêjin PDK êdî daxwaza van herêmên ku bi madeya 140 hatine pênase kirin nake. Kerkûk, Şengal, Celewle, Diyala û Musil di nav de gelek herêmên wisa girîng di nav vê madê de cih digirin. Ji ber ku mijar PDK û çavsoriya desthilatdariya wê ye, ev nêrîn jî bi mirov ecêb nayê.

Li herêma başûrê Kurdistanê PDK ji derveyî xwe kesî wek rêveber ango dikare rêveberiyê bike nabîne. Lewma kesên ku bi vê îdiayê dest bi xebatê dikin jî her tim bi zext û zordestiya PDK’ê re rû bi rû dimînin.

Di vir de dixwazim bi bîr bixim ku PDK ji bo kurdan tenê wisa ye. Di rastiyê de rêveberiya PDK’ê di asta sendroma Stockholmê de aşiqê neyarê gelê kurd e. Ji ber vê yekê ji destpêkê ve bi dewlata tirk re di nav tekiliyeke germ de ye. Niha wisa diyar e ku li gor daxwaz û nêrîna aşiqê xwe bi hikûmeta Bexdayê re hevkariyê dike. Ji bo vê yekê peymana di navbera Bexda û PDK’ê de hatiye mohrkirin parçeyekî neyartiya PDK’ê ya li gelê Kurd e.

Niha tiştа ku em bipirsin ev e; gelo dê PDK bikaribe xwe ji vê Sendroma Stockholmê rizgar bike an na? Ji bo ji vê rewşa kambax a bi gelê kurd dide windakirin vegere pêwîst e çi bibe? Di vê peymanê de ji derveyî hin destkeftiyên madî yên rêveberiya PDK’ê bi dest bixin cudatir çi heye? Bêguman di serê her kurdî de pirsên mîna van pirsan hene. Ya girîng ew e ku bersivên van pirsan, çiqas bi gelê kurd didin qezençkirin.

# Li dijî mirovahiyê komploya herî qirêj

Navenda Nûçeyan

Lêkolîner, nivîskar û rojnamegerê misrî û Serokê Navenda Qahîreyê ya Lêkolînên Kurdî Ebdul Feteh Elî, bi navê 'Ji Ocalan re azadî' têkildarî komploya navneteweyî ya li dijî Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan nameyek nivîsî. Ebdul Feteh Elî, di nameya xwe de balê dikişîne ser komploya navneteweyî û komployê wekî 'Komploya navnetewî ya herî mezin a li hemberî mirovahiyê' pênase dike. Ji gelê ereb dixwaze ku di navbera xwe û kurdan de xwişk û biratiyê pêk bîne.

Ebdul Feteh Elî, di nameya xwe de diyar dike ku bi komploya navneteweyî xwestine pêşiya şoreşa gel bigirin û wiha dibêje: "Ji berî 21 salan dîrokê yek ji rojên xwe yên reş derbas kir ku ya herî reştir rû da. Li dijî Rêberê Kurd Abdullah Ocalan û mirovahiyê komploya qirêjtir pêk hat. Bi rastî yek ji komployên meztir bû ku ne tenê li dijî gelê kurd, li hemberî hemû mirovahiyê bû."

**Sembola têkoşînê**

Elî di nivîsa xwe de balê dikişîne ser sekna Ocalan a ev 21 sal in di girtîgehê de ji bo mafên hemû gelan li ber xwe dide û wiha got: "Bi rastî Ocalan dibe sembol û ekola têkoşîna mirovahiyê. Fikrên ku pêşxistine û xebata kiriye li hemû cîhanê û di nav gel û neteweyên cuda de belav bûye."

**Tecrîdê parçe dike**

Elî di berdewama nameya xwe de destnîşan dike ku li Îmraliyê tecrîd hebe jî li hember hemû astengiyan Ocalan ev bend derbas kirine û nameya xwe wiha didomîne: "Ocalan fikrek li cîhanê parve kiriye û tenê di çarçoveya dîwarê girtîgehê de nemaye. Hemû hewildanên tewankaran nekaribûne pêşiyê lê bigirin. Ev diyar dike ku demek dirêj li ser rawestîn û şîrove bikin. Her wiha girîngiya bîr û hizra Ocalan ji aliyê rewşenbîr, feylesof û bîrmendan ve hêjayî balkişandin, xwendin û guftûgokirinê ye."

**Parastina nirxên mirovahiyê**


Elî di nameya xwe de diyar dike ku kesê ji bo gelê xwe têdikoşe ne sûcdar e, tenê parastina gelê xwe û daxwaza mafê gelê xwe dike û ev tiştê tîne ziman: "Divê civaka navneteweyî, rêxistinên cîhanê, rewşenbîr û xwediyên bîr û ramanê li seranserî cîhanê bi awayek lez û bez ji bo azadiya Ocalan bikevin nav liv û tevgerê. Ji ber ku Ocalan nirxên mirovahiyê diparêze."

**Însiyatîfa navneteweyî hewce ye**

Lêkolînerê misrî balê dikişîne ser berxwedana kurdan a li dijî DAIŞ'ê û wiha dibêje: "Îro Rojava nirxê jiyana hev re ya aştiyane û gelên cuda pêk tîne. Ger kurd nebûna wê Sûriye bi destê Tirkiye û komên wê yên terorîst parçe parçe bibûya. Lewma ev hemû tiştê wiha dike ku dîmenê niha ji yê berê cuda be. Niha rewş guncaw e ku gelê kurd û ereb însiyatîfek navneteweyî ji bo azadiya Ocalan ava bikin."

Lêkolîner Ebdul Feteh di dawiya nameya xwe de wiha got: "Ez di wê baweriyê de me ku gelê ereb di vî şerî de gelek hewil bide, ji bo bihêzkirina biratiya di navbera kurd û ereb de."





## Şer dibe sedema koçberiyê

Şerê navxweyî yê di navbera Efganistan û Talîban ê ku ji sala 1979'an ve berdewam e ev demeke ligel ku muzakere berdewam dikirin jî cardin dest pê kir.

Hefteya borî li başûrê Afganistanê şerê giran dest pê kir û bi hezaran kesan dev ji malên xwe berdan. Li aliyê din ve jî berdevkê Wezareta Karên Navxweyî a Afganistanê Tariq Aryen destnîşan kir ku di nav 2 hefteyên borî de çekdarên Talîbanê 575 êrîş pêk anîne, ji van êrîşan 92 bombe teqandine, 6 êrîşên xwekujî li dijî welatiyên sivîl û hêzên ewlehiyê pêk anîne.

Li bajarê Dohayê yê Katarê ligel ku di navbera Talîban û hikûmetê de muzakere hene jî li başûrê welat di navbera her du hêzan de şerekî giran heye.

Talîbanê êrîş bir ser bajarê Leşkergah ê wîlayeta Helmandê. DYA û hêzên Efganistanê jî ji bo parastina hêzên afgan, êrîşên hewayî pêk anîn.

Ji ber şer bi hezaran kes bi wesayît, otobus û motorsiklêtan ji herêmê reviyan. ***KABÎL***

## Ji bo aramiya welatê xwe îstifa kir

Li Kirgizistanê di 4'ê cotmehê de bi hinceta ku di hilbijartinê de hîle hatibû kirin û deng hatibûn dizîn, çalakiyên şermezarkirinê dest pê kiribûn û komên muxalif ên cuda li gelek qadan kom bûbûn.

Piştî vê bûyerê jî serokkomarê Kirgizistanê Sooronbay Ceenbekov îstîfa kir. Sooronbay Ceenbekov, der barê îstîfaya xwe de diyar kir ku dê nebe kujerê welatiyên xwe û wiha got: "Ez xwe li desthilatdariyê asê nakim. Naxwazim bibim serokkomarek ku guleyan li welatiyên xwe direşîne û bi vî rengî naxwazim bikevin dîroka Kirgizistanê."

Ceenbekov di hefteyên borî de diyar kiribû ku dema welat aram bû ew dikare xwe ji desthilatdariyê vekişîne û dê piştî re jî li benda encamên hilbijartineke nû be.

Her wiha Ceenbekov, bang li Carapov û komên din ên siyasî kir ku alîgirên xwe ji kolanan vekişînin.

Di dawiya dawî de serokkomar bi zexta serokwezîrê nû Sadir Carapov îstîfa kir. Serokwezîrê neteweperest ê ji aliyê parlamentoyê ve hate hilbijartin, dixwest ku Ceenbekov tavilê îstîfa bike. ***BÎŞKEK***



Destar

Ehmed Pelda

## Sazûmaniya aboriya civakî

Tevgerek bi fikrekê dest pê dike; di nav civateke biçûk ango komekê de zîl dide; bi kar û xebatên wê ve can digire û di nav civata mezin de digivire. Êdî tevger bi sazî û dezgehên xwe reng û rîçalê xwe dide der.

Gava destgeh, sazgeh û kargeh hebin, bivênevê sazumaniya aboriya wan jî dibe mijar. Ji ber ku serkeftina xebatên wan bi saya destekariya aborî pêk tê. Peydakirina navgînan, bicîhanîna pêdiviyên karker û xebatkaran, darêkirina plan û pêşnûmeyan bi saya hebûn û bikaranîna çavkaniyên aborî pêkan e. Bi gotina qîrûreş ya zanista aborî serkeftina saziyekê û teşeyê aboriya wê serbiser e lê belê rexnegirên vê dîtina qîr hene û li gor wan serkeftina saziyekê tenê bi cureyê aboriyê re pêk nayê. Cureyê rêxistin, pergal û revaçûna civaka wê û çanda xebat û hevkariyê jî mercên berbiçav û hêja ne.

Tevgera kurdî ya azadîxwaz jî xwediyê wê dîtinê ye ku serkeftina sazî û destgehekê tenê bi navgîna aborî û bi taybetî jî bi pereyan ve girêdan xeletiyeke mezin e. Lewma dîtinên serbiser yên qîr him rexne dike him jî reş dike. Li gor vê xala girîng ya destpêka riya serkeftinê mirov bixwe ye. Asta jîrbûn, zanebûn, xwepêşxistin û ahenga karkirina xebatkaran hêza saziyê jî dide der û rengûrîçalê wê aşkera dike. Saziyeke ku pêkê pê bîne û civaka xwe razî bike, wê bikaribe hewcedariyên pereyan û navgînên aborî jî peyda bike. Lewma pêlazime ku cîvaka xwe jî baş nasbike û planên xwe jî li gor wê binexşîne. Wekî civaka xwediyê rola çavkanî ye ku çi pêdivî hene jê tê girtin. Cîvaka karûxebatê dimeşîne, berhemdariyê dike ku hema bêjin a berpirsiyar û navendî ye û civaka berhem jê re tê pêşkêşkirin divê di nav çapa plansaziyê de cih bigirin.

Bi vî awayî sazumaniyeke jêhatî pekan e û dikare berdêla keda xebatkarên xwe jî bide û hêvî û daxwaziyên civaka dorhêla karê xwe bi kêfxweşî û têrûtije bîne cih.

Ev angaştên me niha rêzkirin hefteya çûyî bûbûn mijara sazûmaniya tevgera azadî li Ewropayê. Ji bo sazûmaniya civaka kurd a li Ewropayê sazkirina rêxistina milê aborî bûbû mijara civîn û nîqaşan. Civîna ku li Hollandayê pêk hat û gelek derdorên saziyên civakî, aborî, hunerî û pîşeyî beşdarbûbûn du rojan semîner dan û gotûbêj kirin.

Di encamê de hat destnîşankirin ku li gor felsefeya tevgerê tenê bi pêşkêşiya pereyan tiştek naçe sêrî, plan û projeyek jî nagihêje encamê. Kirdeyê serkeftinê, destxistina encaman û çêkirina saziyan mîrov bi xwe ye. Ango xebatên rêkûpêk dikarin pereyan jî qezenc bikin, hewcedariyên xebatkaran jî bi awayekî baş bînin cih, sazî û destgehan jî ava bikin û li hemberî êrîşan bi destê civaka rêxistinkirî û hevgirtî xwe pibarêzin jî. Lewma divê ji bo serkeftinê rûmet û hurmet şênî û kedkarên saziyan re hebe.

Destekariya sazkirina kooperatîfan jî di vê çarçoveyê de hat nirxandin. Her wiha hat destnîşankirin ku sazî û destgehên dewletê, şirket û kargehên bi destê kesan tên meşandin hîyerarşîk in. Her tişt girêdayî xwedî an jî rêveberên burokrasiyê yên serdest in. Pîvana serkeftina wan jî qezenckirina pereyan e. Çiqasî bi destê karkerên erzan, bi hejmareke kêm lê bi demeke dirêj û zehmeteke giran xebatan bimeşînin û para qezenca bi pere zêde bikin, xwe ewqasî serkeftî dibînin.

Berevajî vê kooperatîf an jî saziyên bi beşdariya civak û xebatkaran pêk tên saziyên serkeftî ne. Kîjan pergal dibe bila bibe, heskî kapîtalîst heskî sosyalîst be, kîjanê rola civakîbûnê derxistibe pêş, rûmet dabe kedkar, endam, xebatkar, pardar, dilxwaz, dost û hevalbendan ew serkeftî ne. Sazûmaniya dewletê ya Sovyetê encamên ji gel durmayînê re rûbirû maye û têk çûye. Hîyerarşî, şîrket, burokrasî û rêxistina siyasetê ya kapîtalîzmê jî ji vê cudatîr nîn e. Lewma hergav duçarî qeyranên aborî, civakî û siyasî dibe.

Ji bo serkeftina saziyan civakîbûn xala herî girîng tê qebûlkirin. Lewma heke derfet hebin divê kooperatîf bên avakirin. Hemû endam, xebatkar, kedkar û rêveber beşdarî civînan bibin, bêyî rol û hêza kesan di çarçoveyeke hevkar û hurmetkar de gotubêjan bimeşînin. Riya xwe bi hev re zelal bikin, li gor wê jî kar û xebatan parve bikin. Ev ê gelekî bikêr bê ku di asta cîhanî de jî mînakên wiha serkeftî hene.

Xêncî vê, lazim e ku çi kargeh û saziyên takekesî yên aborî ne û niha çalak in her wiha dixebitin jî divê wek saziyên sivîl xwe bi rê bixin, da ku pirsgirêkên di nav xwe de çareser bikin; hevkariya xwe ya pîşeyî bi pêş bixin. Li dewsa rikeberiya navxweyî ya ku ziyanê dide û hêza wan pûç dike, rê û dirbên hevgirtinê xurt bikin û berjewendiyên xwe biparêzin.

Her wiha aşkera bû ku ev dîtin, daxwaz û pêşniyarî bi carekê nagihêjin encamê û lewma divê gelek caran civîn pêk bên, nîqaş bên kirin, semîner û konferans bên sazkirin û di ber re jî kargehên wek kooperatîf, yekitiyên esnafan û hwd. bên avakirin.

Wek gotina dawî, dixwazim li ser navê xwe vê jî parve bikim. Ez kêfxweş im ku piştî nivîskariya Azadiya Welat a bîst sal berê, niha jî li pêşberî xwendekarên rojnameya Xwebûnê me. Bi xêr û pîroz be...

# Çaxa Xelîfe Elî hat Tilelo



Seyidxan Anter

**Li Kurdistanê dîroka perestgehan gelekî kevn e. Kevirên bi tîpa T ên arkeologê alman Klaus Schmidt li Girê Mirazan dîtin, beriya bi 12 hezar salan in. Îca ger dîrokek Mizgefta Mezin a berî zerdeştiyan hebe em nizanin lê tiştê em dizanin, berê ev mizgeft dergeha zerdeştiyan bûye**

Me dabû dû şopa şewata Licê ya sala 1993'yan. Em vegeriyan Amedê û li Deriyê Çiyê ji otomobîla fiat peyabûn. Bi mamoste Amed Tîgrîs re me riya xwe bi Mizgefta Mezin xist. Amed Tîgrîs bi şaredariyê re kitêbek li ser bajarê Amedê amade kiribû.

Yên dîtibin dizanin. Li hewşa Mizgefta Mezin a ji kevirê reş, saeta rojê heye. Me li wê saeta rojê meyze dikir. Di wê navê re, zilamek ku tayên spî ketibûn porê wî, bedil lê, bi gumlekê spî û girewat girêdayî, ji çend peyayên pê re der barê saeta rojê de wisa got: "Dema Xelîfe Elî hate Tilelo, saet li wir bû. Wî ev saet rakiriye û li wir daniye."

Haya efendî jê tune bû ku nivîskarê kitêba Amedê bixwe li wir e. Amed Tîgrîs li zilam nêrî û jê pirsî: "Te got çi, te got çi!?" Zilamê bibedil û girewat, bi "şagirtên" xwe re wek pisîka ziyanan bike ji wir bizir (winda) bû.

Wa diyar e ku li ser Mizgefta Mezin, (ku dewleta tirkan navê wê kiriye Ulu Cami) gor, dergeh û wargehên îbadetan, nemaze yên li Kurdistanê, em ji gelek zanyariyan bêpar mane û bi piranî ji kurdan re nerast hatine gotin.

Li Kurdistanê dîroka perestgehan gelekî kevn e. Kevirên bi tîpa T ên arkeologê alman Klaus Schmidt li Girê Mirazan dîtin, beriya bi 12 hezar salan in. Îca ger dîrokek Mizgefta Mezin a berî zerdeştiyan hebe em nizanin lê tiştê em dizanin berê ev mizgeft dergeha zerdeştiyan bûye. Dûra jî ev wargeh, bi rêzê ji cihû, xiristiyan û îro jî bi her du terîqetên xwe henefî û şafiîyan ve bûye dergeha misilmanan a îbadetê.

Dîrokek Dêra Zahferanê ya bi vî rengî heye. Çaxa mirov derbasî hêwana dêrê dibe li destê rastê oda goran, gorên kesên bi nav û deng ên xiristiyanan hene. Yek ji wan goran a Matran Hana ye ku mamosteyê Apê Mûsa bûye û dîroka Mêrdînê bi tirkî "Mardin Tarihi" lê kiriye. Li rojhilatê odê kulekek gilover heye. Di vê kulekê re tîrêjên rojê dikevin hundir. Mîna Mizgefta Mezin dîrokek Dêra Zaferanê jî heye. Berê ev dêr parêzgeha zerdeştiyan bû. Dûra jî dest guhertine û îro bûye navendek xiristiyanan. Ez behsa Dêra Zaferanê ya salên 1990'î dikim, lewra dûra wê jî para xwe ji siyaseta dewletê û bazirganiyê wegirtiye. Hem di warê avahiya dêrê û hem jî di têkiliyên xelkê bi dêrê ve guhertinên mezin rûdane.

Li bajarê Nisêbînê, li başûrê bajêr, nêzîkî têlên mayinan ên îro dîwar lê zêde kirine, zanîngeha Mor Yaqûp heye. Kavilên wê yên di bin axê de mabûn kolane, plan û avahiya zanîngehê diyar bûne. Mor Yaqûp û zanîngeha Haranê zanîngehên herî kevin ê cîhanê ne. Dûra jî di hewşa Mor Yaqûb de, mizgefta Zeynel Abidîn ava kirine. Niştecihên Nisêbînê ji ve mizgeftê re dibêjin Meyzel Abidîn. Li hêwana mizgeftê hucre, hucreyên goran hene. Di yek ji wan hucreyan de, Eliyê Necîm û bavê wî Nizamettîn Nizammetinogullari veşartî ne. Îca Nizamettinogullari kî ne?

Ji Nisêbîne (ber bi Mêrdînê ve) 3-4 km dûr; li ser rêya Hevrîşimê bi hezaran donim erdên xwe ve çewlika (çiftlik) Nizammetinogullari heye. Sînorê axa vê çewlikê Dala, Dêrê, Bastûnkê, Qişnika û xeta hesin a di nav binxetê û serxetê de ye. Bi hezaran donim erdê vê çewlikê heye. Nizammetinogullari an jî bi gotina xelkê Mala Elîyê Necîm, çawa dikarîbûn hulqas erd (ax) li ser xwe tapo bikin?

Dîrok dûr û dirêj e lê em kin lêdin. Li bajarê Qamişlo hûn taxa Qudur Beg nas dikin. Beriya bajar ava bikin li cihê wê taxê û bajêr avahiyek tenê hebû, xaniyê Qudur Beg. Qudur Beg ne bi tenê endamê "Teşkilati Mahsusa" (bi tirkiya nû Ozel Harp Dairesi) lê berpirsiyarê vê teşkîlatê jî bû. Mala Elîyê Necîm xizmê Qudur Beg in û ji heman tradîsyonê tên û xelk jî dirin wan tewaf dikin.

Rê bidin min ez gotinên nivîskarê swêdî Wilhem Moberg bigihînim we: "Derew ne di tiştên bibêjin de ye, derew di tiştên ku nabêjin de veşarî ye!" Rast e.

Em ji hevdu şaş tênegihên! Ji azadiya baweriyê re gerek sînor tune be lê li cihên ku bawerî bûye ol û dîn, dewlet û siyaset dibe yek; çi dewlet dibe bela bibe, çi dîn dibe bela bibe; neheqî, çavsorî û dijmanatiya li hember nirxên mirovatiyê, bi xwe re tîne.

Çi kes nikare rê li ber bigire ku warê tu lê yî, lê bikole da ku rastiya xwe bi me re parve bike.



# Em deyndarên gelê ermen in

Konê Reş

Di vê nivîsê de, ez nêzîkî zilm û zora ku Osmaniyan li gelê ermen kirine nabim; ne jî nêzîkî beşdariya kurdan di her du fermanên salên (1894 û 1915) de dibim. Her wiha, ez navê wan kurdên bi rûmet ên di wan fermaman de, ermen di malên xwe de parastin jî nabêjim. Bi tenê bi min xweş e ku ez qenciya gelê ermen a di komara Ermenistana Sovyeta Berê de, bi kurdan kiriye, bi kurtî û wek panorama bînim ziman.

Wek ku diyar e di Cenga Cîhanî ya Yekemîn (1914-1918) de, ji ber zilm û zora Osmaniyan beşeke baş ji kurdên me ji welatê xwe mehcir bûn û çûn Ermenistanê. Piraniya wan bi ola xwe êzidî bûn. Mixabin, vê paşiyê, Sovyêtan ew komara ku bi navê (Kurdistana Sor/1923), hatibû avakirin, piştî çend salan, herifandin û Stalîn di salên 1940'î de piraniya kurdên Ermenistanê; çi yên bi ola xwe êzidî û çi misilman, di komara Kazakistan û Sîbîryayê de belav kirin. Ew kurdên li Ermenistanê man, bêproblem jiyana xwe ya normal, bi serbestî, wek ermenan di Komara Ermenistana Sovyêtê de derbas kirin. Li gor şert û mercên wê dewletê, alfabeyeke latînî ji zimanê xwe re bijartin, dibistanên xwe bi zimanê kurdî vekirin û bi wê alfabeyê rojnameya (Ria Taza/ Riya Taze/1930) weşandin. Ev rojname ta roja îro di weşana xwe de berdewam e û ji rojnameyên kurdî yên herî bi temenê xwe dirêj e. Di sala 1950'yî de jî beşeke bi zimanê kurdî di êzgeya Yêrîvanê de vekirin. Ew radiyo jî ji kevintirîn êzgeyên kurdî ye. Di wê heyamê de tevahiya kurdên Kurdistanê li radiyoya (Yêrîvan xeber dide/1950) guhdarî dikirin. Em bi guhdariya dengê van dengbêjan kêfxweş dibûn; Kawîs Axa, Meryemxan, Eyşe Şan, Gerebêtê Xaço, Mehemd Arif... Nexasim dema ku dengbêja dengxweş Aslîka Qadir ev stran: Welatê me Kurdistan e, cî û meskenê me kurdan e. An Gerebêtê Xaço strana; Lawikê Metînî, an dema ku Kawîs Axa strana Şêx Mehmûdê Hefîd; Hawara tirkan dûr e kurd xayîn in digot. Li vir dipirsim; çima ew dibistanên kurdî di nav wan kurdên me yên komarên Sovyêtê yên din de wek Yêrîvanê nedihatin vekirin, tevî ku hejmara wan baş hebû? Mebesta min Baku û Teblîs e.

Ji encamên ku ermenên Ermenistanê rê li ber kurdan vekiribûn, kelem li ber wan dananîn, ziman û kultura kurdî baş bi pêş ket. Dikarim bibêjim, ji her çar parçeyên Kurdistanê, pêşketîtir bû. Nexasim bi pênûsa wan kurdên me yên bi ola xwe êzidî ne û dikarim van çend navên sereke ji wan bînim ziman: Qenatê Kurdo, Haciyê Cindî, Casimê Celîl, Şikoyê Hesen, Keremê Seyad û wiha bi dehan nav hene.

Her wiha ji qenciya wê Komara Ermenistanê û wan kurdên me yên lê çêbûbûn, xwendibûn û mezin bûbûn wek: Dr. Celîlê Celîl, Ordîxanê Celîl, Cemîla Celîl, Tosinê Reşîd, Eskerê Boyîk, Teymûrê Xelîl Muradov, Şeref Aşîriyan, Eliyê Abdulrehman û gelekên din, ew ên ji sala 1982'yan ta bi sala 1992'yan, hatin nav me kurdên Rojava, me sûdeke mezin ji wan girt. Bi hatina wan re, çavên me bêtir vebûn. Bi rastî wan rolek mezin di şiyarkirina me de lîstin; şîraniya zimanê me bi me dane naskirin, nav di me de dan ku em guhdariyê li zimanê xwe bikin; li pêmayên bav û kalên xwedî derkevin, kultur û folklora xwe bidin hev û binivîsin.

Her wiha jî ji qenciya ermenan ku gelekan ji wan stran bi kurdî gotine û zimanê me parastine wek: Gerebêtê Xaço, dengbêjê bejinbilind Aramê Dîkran xwediyê strana; Zimanê kurdî şîrîn û xweş e; Mîlkonê Nadir ê bi strana Filîtê Quto navdar bû; Bîdrosê Ermen ê deng xweş. Ez ne bawer im neferên miletekî din di dinyê de wek neferên gelê ermen wiha stran bi zimanê kurdî gotine. Ji ber van yekan, ez dikarim bibêjim ku em deyndarên gelê ermen in.

# Anatomiya jîneke kuştî

Dilbirîn Dilo

Destê xwe yê qirêj ji ser laşê min ê bi qirêjiya destê te qirêjî bûye bikişîne, ji bo sibêrojê laşê min ê bi destê te yê qirêj qirêjî bûye, bi xwîna min a sor û şolî neşoyî. Jixwe tu min nekujî jî ez ê xwe bi werîsê ji porê keçikên nûgihiştî hatiye honandin, ji vê qirêj û gemariya te paqij bikim.

Netirse! Wê tetika ji bo kuştina kuştiyan hatiye çêkirin bikişîn. Na na, ez jî natirsim mêze neke ez digirîm, ji bo xwe nagirîm ji bo te digirîm; dilê min bi te dişewite tu bi qurbankirina min dibî qurban.

Ez im ew benikê di dest min de û tetika wê demançeya di destê te de; tu bixwazî jî nexwazî jî ez ê bêm kuştin an bi destê te an bi destê xwe an bi riza te an bê riza te... lewra te ez bi zindî xistim bîra bêbinî ku ne di bîra ti kesê de ye! Dema ez mirim, min di bîra keçikên hê di dergûşa xwe de ne veşêre keko, yên biryara mirina wan hatiye dayîn. Bira ew min bi bîr bînin; jixwe ez im jiyana wan, wê ez ji bîra wan neçim.

Piştî van gotinan demançeya min di dest min de ma û ez di ciyê xwe de mam mîna peykerekî hezar sale. Min qet ji wê keçika di destê min de za, ev peyv nedipan. Wê ez ji xewnek giran û bêbext hişyar kirim; van peyvên feylesofane ji bo wê jehra di nav mejiyê min de bû dermanek û ez ji wê jehrê xelas kirim; ez kirim jehreke ji jehrê pakbûyî, ez berdam nav wê civaka jehrokî; ez kirim endezyarê jehra ku di binhişê min de cî girtibû û êdî jehra xwe ez çêdikim lê jehra min ne kujerê zarokan û jinan e; kujerê kujeran e. Wan ji jehra wan a kujer xelas dike.

Civaka min, dê, bav, ap, xal, met, xaltî û hwd. ji min re bûbûn mar û dûbişk û ez jehrokî kiribûm; ewqas li min bandor kiribûn ku ez xwişka xwe ya pazdeh salî bikujim. Ew keçika ku hêna nizane xêr û guneh çi ne, başî û ne başî, qencî û neqencî çi ne... Ew keçika ku heta duh jî ji bo şekirê qulqulî digiriya îro bûbû hedefa jehra civaka min û li ber destê min li ber rehma min lê ne bi tirs û xemgînî, bi wêrekî li hember min e tirsê dixe dilê min. Min ditirsîne, nema ez karibim li piyan bisekinim çongên min dilerizin, destên min bi ber min ve dimirin nema êdî dikaribim biaxivim.

Min bi destê xwişka xwe girt û min ew bir ser dixtor, bira binêre ka qîz e an na! Lewra ji min re gotibûn bi şivanê gund re bûye; şivan ew xerab kiriye; qîzaniya wê jê girtiye û reviyaye lê ew jî dibêje tenê li ser kaniyê av ji min xwestiye û min jî daye wî ji xeynî vê ti tiştek di navbera me de neqewimiye.

Piştî dixtor ew dît mieyne kir mêze kir paqij e, qîz e... Hişê wan kesan hatiye tecawizkirin ne bedena vê keçika pazdeh salî. Em çûn malê min ew rapor li rûyê tevan da û min xwişk anî vî bajarî. Vê jinika di doza te de jî bû parêzerê te. Ew keçika pazdeh salî bû niha em her du jî di komeleya parastina mafên jinan de dixebitin.

Ez im êdî parêzer û parastinerên wan keçikên bêguneh; ez im yek ji wan birê wan. Êdî min jî xwe bi jehra maran paqij kir, ez bûm paqijê gemaran, gemarê gemaran; ez jî bûm yek ji ferîştehên bihuştê bi wan peyvên zêrîn; ez jî bûm pêxemberekî bêguneh bi wan ayetên ku ji devê xwişka min a bêxebînet dibarîn. Êdî ez jî bendeyê xwedayê ûjdanê xwe me.

# ‘Adem bê ti kî nê meyweyî ra biwere’ (6)

Mehmet Seyîtalîoglu



Adem xapîya. Ame ey kî ê meyweyî dare ra tam kerd, werd. Se ke werd tacê serî sere ra pera ra şî. Hêq û teala cira hêrs bî. Adem çêberê tobî ra, gina çêberê ramê ra, Govelêke çêberê nalêtî ra, verê çebêrê xişmî ra, ezî kî tey, çêberê qêday ra eyştîme teber. Ma pêro pîya cayê xo ra bîme. Nika kî xo rê nê cayê de mekanê Xizir Nebîyî der o. Îta xo rê pînîme. Teyra Tawse ke nîya vat. Qesê xo xelesna. O wext Xizir Nebî uca de vejîya.

Belkîya şî dest û linganê Xizir Nebî. Cer ver o, derdê xo ci rê ju bi ju ardî ra zon, qese kerdî bî. Xizirî Belkîyayî ra vat;

-Şo dîyarê koyê serî de ban esto. Yê nê banî çar çêberê xo estê. Ti ke reyştî ê banî vaje ‘Ya Xizir, ya Heq keremê xo ra ti rahaman û rahîm î. O wext çarmîna çêberî to rê tê dima benê ya. A tew ez to beno resneno welatê to. Nê, eke ceremê to hona nêqedîyayo se to rê çêberî nêbenê ya. Ti gere koyî ser de çen serrî bifetelî bêrî.

Belkîya uca ra birîya kewt raye, terkit şî. Koyê serî. Şî lewê ê banî. O bano ke çar çêberê xo estê, hawo uca. Şî verê banî. Vat;

-Ya heq, ya Xizir.

Dest eşt çêber. Çarmîna çêberî ci rê bî ya. Belkîya şî zerre. Şî uca de xeylî mend. Destê xo day ra Xizir’î. Xizir’î o eşt terkê astorê xo yê qirî kewt raye. Belkîyayî çimê xo girewtî, badê kerdî ya welatê Xorasan de vejîya. Na mesela xo kî tîya de qedîyaye.

-Ya Camîşan, Belkîyayî hondê ezyat dî. Ma ti çito dinya de roştî bivînî, vat Şayhê Maran.

Tenê ke mend. Camişanî vat ke;

-Ya Şayhê mi, sêr ke. Çar çêberî ci rê bî ya. Sek Belkîya şî zere cemalê peyxamberê axir zemanî dî. Çay ti henî vana. Ti vana çito dinya roştîye bivînî. To ra mîneta mi awa ke ti mi vejî dinyaya roştîye. Teselîya Şayhê maran kewte. Vat ke;

- Ti kî cinsê benî ademî ra yî, to rê ne îtîbar beno, ne kî to ra xelasîya mi esta. To ke sondî wendî, ti bê kenay, suke de mevindere, hamam de awike mekere xo ro ez to vejeno dinyaya roştîye.

Camişanî vat ke;

- Kitabê pîlî ser o sond waneneo ke, tobe keno ke ez suke nêvinderî, ne kî şêrî hemam de awike xo ro kerî

Şayhê Maran vat;

-Bizane ke canê to sey canê ma pilangin beno, têde belekîno. Ti ke suke de ronîşî, şêrî hemam de awike xo ro kerî, juyîna ju to vîneno. Qulo di ling to nîya pilangin bivîno keweno ma dima rew bo erey bo cayê ma doz keno. O taw şima qulêheqan destî ra xelesîyena ma nêmanena.

Na vatena xo ra ra dima axirî Şayhê Maran amey camerdîne. Vengê çutê maran da, marî amey. Maran Camişan girewt, a lona ke Camşan piro amo a lone ra tepîya vet ro dinyaya roştîye.

Camişan ke vejîya dinya roştî terkit şî çeye. Maya xo ya kokime mereq û qisawetan ra bîya kor. Virane arde jubînî ra jubînî de bî şa. Kesereta xo jubînî rê arde. Maya xo û lajê xo jubînî re şa bî. Cinîke çay şa nêbo. Camişan tam hewt serî yo ke vîndîbîyaye bîyo. Tenêke mend maya xo ra vat;

-Dayê urze mevinde. Cil û coranê xo arê de ma tîya ra şîme.

Maye vat;

-Nê nê biko, ma bi na fêqîrîya xo kata şîme. Şîme kotî?

Camişanî vat ke;

-Tobe bo ke ez ne herdî de daha nêvindeno. Bê bar kîme şîme. Şîme koyan.

Hurdmîne çeyeyê xo bar kerd şî ko. Şî koye de xo re gomê viraşt. Kewtî ci. Uca de mendî. Camişanî xo re leyî de awike nanê ser. Kerdêne germ çerxê de kerdêne xo ro. Ta wext o ca de wêşîya xo ramite.

Rojê paşayê suke, suke de nêweş keweno. Der û maraz vêja bî. Kule vejîyaybî. Kule leşa paşayî girewtîbî xo ver. Paşayî rê dermanî bibî hestere. Neçê cerrahî û doxtorî fetelnaye, neçê doxtorî ardî ser ci rê derman nêdî.

A suke de ju xoce estbî. Nameyê xo Seymur xoce bî. Ey kitabê xo girewt xo dest wend. Kitabê xo de wend cayêde raştê ci ame ke kulanê paşayî rê goştê Şayhê Maran rind yeno. Kitabê xo girewt ame saraya paşayî. Vat ke;

-Paşayê mi, derdê to rê derman esto. Goştê Şayhê Maran kulanê to keno weş. Derdê to rê derman o. O ke nêbo to rê weşîye çin a.

Paşayî vat ke;

-Ma ti nêvanî. Ma Şayhê Maran kotî ra bivînîme?

Ey vat;

-Ma çay na xebera zor a, çik a? Venga miletî de, tedîne biruşne hemam de awike xo ro kerî. Canê kamî ke pilangin o sey marî bereqîno û belekino, demek ke o herinda Şayhê Maran zaneno.

Na xebere ser o paşay telal da piro, cayê de kes nêverda. Ard hemame de awike kerde piro, Hemamde awike pirokerdene de keso pilangin û belek nêdî. Pers kerd. Kes cayê de mendo ya kî nêmendo. Vat ke falan ko de xortêk esto. Vanê o hona nêyamo hemam de awike nêkerda xo ro. Paşayî peyayê xo ruşnayî, Camişan bidî ardene. Şî Camişan dî. Ci ra va ke;

-Gerek ti bêrî hemam de awike xo ro kerî.

Camişanî vat ke;

-Mi sondî werdo. Tobe kerdo. Ez gere hemama de awike xo ro mekerî. Ez xo rê leyde awike nano ser, keno germ, çerxe de keno xo ra. Ez caro hemam de awike nêkeno xo ro.

Peynîye de mordeman zor kerd. Camişan girewt berd hemam. Kinc û kolî ci ra vetî. Kerd rut û repal. Awike kerde piro. Canê Camişanî pilangin û belekin dî. Cane Camişanî sey marî belekin bî. Seymur Xoce Camişanî ra vat;

-Ti cayê Şayhê Maran zanenî. Çike canê to sey canê maran pilangin o û belekin o. Gerek ti herinda Şayhê Maran ma ra vajê. Ma şîme Şayhê Maran bicîme bîyarîme. Çike goştê Şayhê Maran paşayê ma rê derman o. Şayhê Maran ke nêbo, paşayê ma weş nêbeno.

Camişanî se kerd xo înan dest nêxelesna ra. Berd ke vile piro dî. Camişanî serê xo nêda, le sirê xo da.

Dima Camişanî û Seymur Xoce û teba tay mordemê xo girewtî berdî kupe ser. Ez na kupe ra şîyo. Mi Şayhê Maran dîyo. Şima kî îta ro şêrê Şayhê Maran bivînî û bîyarî.

O wext Seymur Xoceyî kitabê xo kerd a rone ser o wend. Xelî wext ke wend sêr kerd ke Şayhê Maran na yo cêr ra ancîno we yeno. Eke vejîya ame ser, seke çimê Camişanî gina Şayhê Maran, Camişanî xo eşt pey dare. Vaz da xo da we. Şayhê Maran vat ke;

-Camişan xo caro merze pey dare, xo medare we. To sondî werd ke nameyê mi nêdî. Herinda mi nêvajî. Nika kî çaye vaz dana pey dare ! Gereke ti bêrî mi piştî kerî berî.

Camişan pey dare ra vejîya ame. Berba. Axirî Şayhê Maran kerd piştî ginayî raye ameyî.

# Şaredarîya Çewlîgî de 20 milyon TL zirar

Şaredarê AKPyî Haci Ketenalp Xana Gureyî ke 91 esnafî tede estî, bi 5 milyon û 656 TLyan vetbî îhale û rot bi. Hasan û Huseyîn Kansu, Îsa Korkulu û Huseyîn Acar îhale qezenc kerdbî. Labelê seba ke îhale de parsel û tahsîlat senî bibo nêameybi diyarkerdene, esafê xane seba betalkerdişê îhaleyî muracatê Mehkemaya Îdarî ya Xarpêtî kerdbî. Dima ra mehkema qerar daye ke çîyo ke ameyo kerdene teberê Qanûnê Îhaleyî yo û îhale betal kerde.



Kesê ke îhale qezenc kerdbi seba betalkerdişê qerarî muracatê Şuraya Dewlete kerdî. Şuraye serra 2013î de îtirazo ke ameybi kerdene red kerde. Wexto ke Şuraye qerar betal kerde, şaredarê AKPyî yê o wextî Serdal Atalay bî. Gama ke nameyê Serdal Atalayî vejîya ke karê xo baş rayîr nêbeno, Atalay heme karê xo rêz keno û pawitişê xo de vano ke bi betalkerdişê îhaleya Xana Gureyî nizdîyê 25 milyon TL qaseyê şaredarîye pir kerdo.

Badê vatişê Atalayî 4 kesê ke îhale qezenc kerdbî muracatê 1. Mehkemaya Aslî ya Çewlîgî kerdî. Nê 4 kesî vatî ke ê îhale qezenc kerdî û tapu zî îna ser de yo, labelê şaşîyê keso ke îhale veto îhale vera ê zirar kerdî. Nê kesî waştî ke bedelê awanîye bêro testpîtkerdene û aye gore hîseyê înan bêro dayene.

Înan ra dima mehkema kesêk zana tayîn kerd û no kes raporêk hadre keno. Dima ra mehkema qerar dano ke ganî 6 milyon TL bidiyo Huseyîn Acar, 4 milyon û 500 hezar TL bidîyo Îsa Korkulu, 2 milyon û 250 hezar TL bidîyo Hasan Kansu û 2 milyon û 250 hezar TL zî bidîyo Huseyîn Kansu.

Sewbina mehkema qerar daye ke 5 milyon û 656 hezar TL zî bedelê îhaleyî tewrê faîzê ci bêro hesabkerdene û Şaredarîya Çewlîgî yew milyon TL heqê doze bida. Şaredarê AKPyî Atalayo ke seba ena xane hende pesnanê xo dabî, tewrê mesrefê doze û faîzî pêropîya 20 milyon TL şaredarî kerd zirar. *ÇEWLÎG*



## Dewey Ma

Cemîl Oguz
cemilo@diyarname.com

# 113 tenî

Kayeke teatra çende tenî temaşe kenê? 10, 20, 50, 100, 250? Çende tenî? Rewşa normal de 200 yan 250 tenî. Ez çiya ra zana? Ez sero xebetiyawa.

Kadikay de salona Tiyatroyan a Girêdayî Şaredariya Bajarê Pîle “Hadun Taner Sahnesi” ya ke 286 kursî qeybî temaşekerdoxan estê. Rewşa normal de heme pirê bê anekiya. La enka serdema pandemî esta û nîme nîme temaşevanan gênê. Sehneya tewr pîl "Harbiye Muhsin Ertugrul Sahnesi"ya ke cay 598 tenî tede esta.

Salona “Gaziosmanpaşa Sahnesi” de cay 227 tenan esta. Rewşa normal de. La enka semedê pandemî kursî ke veng verdenê, yanê ma nîmey cê hesab bikerê dewrê 113 tenî. Ma bêr serê mesela: Teatrakaranê kurdan, endamanê Teatra Jiyana Nû gere kayey xo ya bi namey “Bêrû” 13.10.2020’inan de Gaziosmanpaşa Sahnesî de kay bikerdê, la Qeymeqamê Gazîosmanpaşa kay qedexe kerd.

Tarîxey Teatroyanê Bajêr a Stenbolî (1914 de hamî viraştişî) ke bî 106 serî qe ca nêdabî teatrayke bi kurdî. Enka Şaredariya Bajarê Pîle ya Stenbolî zey rey joyînan ca da kayêke bi kurdî. La Qeymeqamî nêverda.

Bilêtê kaye heme hameybî rotiş. Pers enewa: Ga çende tenî şorê temaşe bikerê? Bersiv: 113 tenî. Baş o, 113 tenî şorê teatrayke bi kurdî temaşe bikerê go dinya biqelebiyo? Go sebo? Ma 113 tenî go beşkê kurdî asîmîlasyon ra bixelesnê? Helbet nê. Mesela a wa ke hem neyartiya ziwanî tiya esta, hem zî nêwazenê kurdî bibo meşrû, kurdî miyanê xebatanê Şaredariya Pîle ya Stenbolî de ca bigîro... Nêwazenê gamêke zî kurdî raver şoro. Heme mesela enewa. Ene kaye, kayeke Dario Fo ya, dinya de zehf welatan de hamiya kaykerdişî, Tirkiya de zî verî bi tirkî zehf rayan hamiya kaykerdişî. La bi kurdî qedexewa. Semed kaye niya, semed ziwanê kayewo.

Erê 113 tenî nêşkenê kurdî asîmîlasyon ra bixelesnê, la reyna zî nêwazenê ê 113 tenî zî goş bidê kurdî, ro kurdî temaşe bikerê. Nêwazenê hîsêke kurdî miyanê însanan de bibo xurt.

Nê, ez nêvana semedê ene joy wa her kes wayîr ro kurdî veciyo, wa biko miyanê xebatan û nizana çi... Her kes bi kêfê xo yo, wazeno wa ziwanê xo raver bero, wazeno wa ziwanê xo bikero vinî. La wayîr zî veciyo, ziwanê xo bikero vinî zî qîmetê cê anekî miyanê însanan de eyseno. Hesab kîtab merdim bi xo keno. Hestê edaletî, wijdanê merdimî ger destûr dano ke ziwan vinîbo wa vinîbo, la ger wijdanê merdimî vano wa ziman nêbo vinî, a çaxî gere merdim ziwanê xo xurt bikero.

Erê 113 tenî zehf çî niyê, la her merdimê ke zey gilokey vewrewo, giloke bi giloke bena pîle. Ê gir biryarê qedexeyî danê hay ro ene joy estê loma qedexeyke aneyîn danê. Eno qedexe qedexeyke qic niyo.

Axir heme çî di destê însanan de wo. Însanî eşkenê ziwanê xo bikerê vinî zî, ke dinya de bi hezaran ziwanî biyê vinî. Însanî eşkenê ziwanê xo vînîbiyayîşî re bixelesnê zî ke eno het ra zî dinya de nimûney estê.

Û persê peyînî: Ê 113 tenan çi hîs kerd? Go se bikerê?




# Dema we xweş be, gelî hêjayan!

Zûgotinok an jî çîvanok, di nav wêjeya kurdî ya gelerî de heye. Zûgotinok herî zêde di şevbihêrkan de dihatin gotin û bi taybetî wekî pêşbirkekê di nav zarokan de dihate kirin. Civat û şevbihêrkên berê ku berî televizyon û înternet bikevin nav malan bi çîrok, çîvanok, stran û sohbetan derbas dibûn lê bi hatina televizyonan re ev çand ji holê rabû û zarokên niha êdî tiştekî der barê wê çandê de nizanin. Em dixwazin di vê rûpela xwe de hem li wê çanda bav û kalan vegerin, hem jî wê çandê nîşanî zarokên xwe bidin. Divê wekî dê û bav her ji çend rojan kêliyek be jî em ji zarokên xwe re behsa jiyana xwe ya berê bikin; behsa çîrok û çîvanokên bav û kalan, da û dapîran bikin.

Ji bilî çîvanokan tiştekî din jî hebû ku di wan şevbihêrkên berê de dihatin gotin ew jî mamik bûn. Di vê lîstikê de pesnê tiştekî dihate dayîn û ji civatê dihate pirsîn ma ew çi ye. Wekî mînak digotin: Mamê min ê mamanî, an jî tiştek min heye (bi şev bûk e bi roj pepûk e) kî dizane ew çi ye? Êdî kesên ku bersivê dizanibûn digotin ev filan tişt e.

Lewma em dixwazin di serdema nû ya weşana xwe de cih bidin vê çanda bav û bapîran, da û dapîran û her hejmarekê çend tiştan der barê mamik, tiştanok, zûgotinok an jî çîvanokên kurdî bi we hêjayan re parve bikin. Em ê ji vê hejmarê û pê de êdî hewl bidin li wê çanda xwe vegerin û bi zarokên xwe bidin nasîn da ku bêtir ji zimanê xwe hez bikin.

# Tiştanok an jî mamik

Qerf, henek an wekî dibêjin yarî di nav ziman û çanda kurdî de xwedî cihekî taybet in. Lewre divê em xwedî li vê çandê derkevin û em nehêlin ku wenda bibe. Ji aliyekî din ve bi vî awayî em zimanê xwe li ber dilê zarokên xwe şîrîn dikin. Di nav kurdan de berê di civat û şevbihêrkan de gelek caran ev mamik an jî tiştanok dihatin pirsîn û bersivandin. Bêguman demên berê ne wekî niha bû; civat digeriya, gundî li hev diciviyan û şevbihêrkên xwe bi hev re derbas dikirin. Di van şevbihêrkan de çîrok, stran, pêkenî, mamik û zûgotinok dihatin gotin. Pirsîna mamikan wekî pêşbirkekê bû. Kesê ku pirsa xwe dikir, bi vê hevokê dest pê dikir û digot: Tiştek min heye (pesnê tiştekî dida û paşê digot) kî dizane ew çi ye?




Kî dizane ev çi ye?

**1-** Xişt û mişt çû dergehê rûnişt
**2-** Koka wê di erdê de ye, nava wê di dîwar de ye û serê wê di mirov de ye?
**3-** Koleyek tê ji deştê barê striyan li piştê.
**4-** Kaniya qinê qinê, mîr û beg dest didinê.

**Bersivên mamikan ev in:**

**1-** Melkes, gezik. **2-** Genim. **3-** Jîjo. **4-** Poz.



## Zûgotinok

**De ka em îro dest bi 3 zûgotinokan dest pê bikin:**

•Kî dikare 3 caran li ser hev bêje?

**Ez çûm mala Xalê Mele Remezan,**
Min go mala Xalê Mele Remezan
Ka mera mala Xalê Mele Remezan.

•Ew nebû 3 caran li ser hev wiha bêje.

Pirça pişta histê hirçê bihostek.

•De îcar 3 caran li pey hev bêje.

Kurm qurm qul kir.

# XAÇEPIRS

| | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | 2 | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ | 3 | | 4 | ■ |
| | ■ | | ■ | ■ | 5 | | | | ■ | | ■ |
| 6 | | | | ■ | | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ |
| ■ | ■ | | ■ | ■ | | ■ | 7 | | 8 | ■ | ■ |
| 9 | 10 | | | 11 | | ■ | | ■ | | ■ | ■ |
| ■ | | ■ | ■ | | ■ | ■ | 12 | | | 13 | ■ |
| 14 | | ■ | ■ | | ■ | ■ | | ■ | ■ | | ■ |
| | ■ | ■ | 15 | | 16 | | | | ■ | | ■ |
| 17 | | ■ | ■ | ■ | | ■ | | ■ | ■ | 18 | 19 |
| | ■ | ■ | 20 | ■ | | ■ | ■ | 21 | ■ | ■ | |
| | ■ | 22 | | | | 23 | | | ■ | ■ | |
| | ■ | ■ | | ■ | ■ | | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ |

JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

1. Heywanekî bisaw, bi zikêşkê dimeşe û jehra wî dijwar e.
3. Şebeke, tayên raçandî yên ji bo masîgiriyê
5. Tev, giş 6. Heywanekî bistirî 7. Xwişk 9. Pêşkêş, berpêş. (gotineke ji soranî ketiye nav kurmanciyê)
12. Asteng, berbest, her wiha di nav faris û kurdan wekî navê pêxemberekî jî derbas dibe.
14. Cînavkek pirjimarî 15. Ronahiya çav, şiyana dîtinê
17. Sewaleke ku ji bo şîr û hiriya xwe tê xwedîkirin 18. Bersiva neyênî 22. Tevahî, ji vî serî heta wî serî.

JI JOR BER BI JÊR

1. Hewaya şil û ne zelal, moran
2. Hunermendeke jin ji bakurê Kurdistanê
3. Fêkiyeke havînê 4. Notayeke Muzîkê
5. Biçe 7. Berdewamî
8. Pîvaneke giraniyê
10. Alaveke şer a kevin
11. Celebeke kûçikên nêçîrê
13.Dewleteke zalim ku bi darvekirinan bi nav û deng e
14. Gelekî xiristiyan ku berê bi kurdan re li ser heman erdnîgariyê dijiyan
16. Awaz
19. Ji nişkan ve
20. Pevçûna bi çekan
21. Agir
23. Notayeke muzîkê

*Bersiva hefteya borî*

| | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 W | A | 2 N | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ | 3 Î | R | 4 O | ■ |
| A | ■ | Ê | ■ | ■ | 5 Î | M | A | N | ■ | K | ■ |
| 6 X | A | Ç | O | ■ | Q | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ |
| ■ | ■ | Î | ■ | ■ | A | ■ | 7 Ş | A | 8 M | ■ | ■ |
| 9 K | 10 A | R | S | 11 A | Z | ■ | E | ■ | E | ■ | ■ |
| ■ | R | ■ | ■ | F | ■ | ■ | 12 R | I | H | 13 A | ■ |
| 14 Î | D | ■ | ■ | I | ■ | ■ | V | ■ | ■ | M | ■ |
| M | ■ | ■ | 15 Ê | R | 16 Î | V | A | N | ■ | Î | ■ |
| 17 R | E | ■ | ■ | ■ | C | ■ | N | ■ | ■ | 18 N | 19 A |
| A | ■ | ■ | 20 K | ■ | A | ■ | ■ | 21 M | ■ | ■ | N |
| L | ■ | 22 G | U | H | D | 23 A | R | Î | ■ | ■ | Î |
| Î | ■ | ■ | N | ■ | ■ | Ş | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ |

# ‘Bêrû’ rûyê wan ê rast nîşan da

Navenda Nûçeyan

**Li Stenbolê qeymeqamtiyê lîstika şanoya bi kurdî ya bi navê ‘Bêrû’ qedexe kir û gelek şanoger û nivîskaran piştgirî dan şanogerên kurd. Bi qedexekirina lîstika kurdî rûyê wan ê rast careke din derket holê**

Şanogerên kurd bi dehan sal in li hemberî astengî û qedexeyên dewleta tirk, bi derfetên xwe yên hindik hunera xwe didomînin û heta niha gelek berhem afirandine. Nêzîkatiya dewletê ya li hemberî çand û zimanê kurdî naguhere û rêbaza qedexeyan didome.

Qeymeqamitiya navçeya Gazîosmanpaşa ya Stenbolê, lîstika Bêrû: Klakson Borîzan Bîrt a wê ji aliyê Teatra Jiyana Nû ve li dika Şanoyên Şaredariya Bajarê Mezin a Stenbolê bihata lîstin qedexe kir. Qeymeqamtiyê berî lîstik bê lîstin, beriya bi saetekê bi hinceta “pergala cemaweriyê xera dike” qedexe kir.

**Şanogeran biryar şermezar kir**

Li dijî vê biryarê rêxistinên şanoyê bertek nîşan da. Îzmîr Bagimsiz Tiyatrolar Înîsyatîfî, Kadikoy Tiyatrolari Platformû, Karadenîz Tiyatrolar Bîrlîgî Dernegî, Oyuncular Sendîkasi, Tiyatro Ureticileri ve Yapimcilari Dernegî û Tiyatromûz Yaşasin Înîsyatîfiyê bi tirkî û kurdî daxuyaniyeke hevpar dan û biryara qedexekirinê şermezar kirin û piştgirî dan şanogerên kurd.

Cîgirê Wezîrê Karê Hundir Îsmaîl Çatakli û waliyê Stenbolê Alî Yerlîkaya tekîldarî mijarê daxuyanî dan û di daxuyaniyê de şanoger kirin hedef. Çatakli îdia kir ku lîstika şanoyê ya ji aliyê nivîskarê bi nav û deng Dario Fo ve hatiye nivîsandin propagandaya PKK’ê dike û careke din şanoger kirin hedef.

**TJN li ber xwe dide**

Teatra Jiyana Nû (TJN) di vê serdemê de jî di nav çend komên şanoyê kurdî de, bi lîstikên xwe çalak e. Kom ji sala 1992’yan ve li Stenbolê, bi awayekî domdar û bi lîstikvanên nû re her tim bi lîstikên kurdî heta îro di bin banê NÇM’ê de karên xwe didomîne. Di van 28 salan de gelek şanoger di TJN’ê de cih girtin. Îro jî weke malnîşaneke şanoya kurdî li ber xwe dide û hunera xwe pêşkeş dike.

**Cara ewil evqas bû rojev**

Şanoger û dramaturg Çetoyê Zêdo têkildarî mijarê ji rojnameya me re axivî û destnîşan kir ku heta niha li Tirkiyeyê gelek lîstik hatine qedexekirin, dest danîne ser sehneyan lê cara ewil e evqas dibe rojev û wiha got: “Ji roja roj de li Tirkiyeyê, bi qasî vî çendî şanoya kurdî nebûbû rojev. Qedexeyên bi salan e weke rûtîneke dewletê her tim pêk dihatin, vê carê çi bû sedem ku ji berê bêtir kete rojevê? Ev qedexekirin ne tiştekî nû ye. Berî her tiştî refleklekseke desthilatdariya dewletê ya giştî ye ku hêza xwe ji tirkbûnê distîne.”

**Helwesta çapemeniya tirk**

Çetoyê Zêdo diyar kir ku ji berê de şanoya kurdî ji rê û dezgeyên “sehneyên giştî” bêpar û bêwar e û wiha got:



“Berî ku lîstika TJN’ê ‘Bêrû’ li Stenbolê were lîstin, ewil di çapemeniya tirkî de bi du awayî cih girt; yek jê, vê pêşandanê weke bûyereke ‘dîrokî’ nirxand û tev li nav 106 saliya ÎBŞT’ê dikir. Şanoya Bajêr a Stenbolê (Dâru’l-bedâyi-i Osmânî, 1914) cara ewil bû û ew ê cih bidaya şanoyeke bi kurdî. Li aliyê din a çapemeniya tirkî antîpropagandaya vê şanoyê dikir û şaredariya Stenbolê bi hevkariya terorîstî tohmet dikir. Piştî qedexekirinê ji bo vê tohmetê îspat bike ‘lêpirsîn’ da destpêkirin lê îro reng û aliyê lêpirsînê ber bi Qeymeqamtiya Gazîosmanpaşayê ve zivîriye, dibe ku dîsa li şanogeran vegere. Li Tirkiyeyê her tişt guherbar e. Xuya ye ew ê encamek jê derkeve lê mirov nizane wê kî li xisar an li fêdê be?”

Zêdo di dawiya axaftina xwe de ev tişt got: “Ka em careke din bifikirin? Helbet esasê vê bûyerê, ne huner û şano ye. Şanoger û rewşenbîrên tirk ku li ser vê qedexeyê careke din fêm kirin ku ev qedexe li ser hebûna kurdî ye! Bi hêviya ku ew ên piştgiriya huner û zimanê kurdî dikin, bikaribin bibin xemxur û hevkarên huner û zimanê xwe, ne ku bi devkî bibe ezbereke gotina dawî ‘rûmeta me ye’.”

# Hinek Henek dilê temaşevanan xweş kir

Navenda Nûçeyan

Beriya çend rojan, bernameya Hinek Henek ku ji skeçên henek û yariyan pêk tê, li Stêrk TV’yê dest bi weşanê kir. Bername, li gorî saeta welat her roja sêşemê wê di 21.00’an de bê weşandin. Bi rastî dema ku mirov bala xwe dide bernameyên televizyonên kurdî, hewcedariya bi bernameyên wiha rengîn bi rengekî beloq derdikeve ber çavan.

Televizyonên kurdî bi piranî berê xwe didin bernameyên siyasî û ew aliyên din piştguh dikin. Ev yek jî bandoreke neyênî li rêjeya temaşevanên wan dike. Temaşevên kurd ji ber wan kêmasiyan berê xwe didin televizonên bi tirkî û erebî da ku wî aliyê xwe yê kêm dimîne têr bikin.

Loma jî ev projeya Hinek Henek gelekî di cih de ye û hinekî wê kêmasiya heyî dagire lê bêguman têr nake û divê gelek bernameyên wiha rengîn û tenê ne şano lê rêzefilm û bernameyên pêşbirkan jî werin amadekirin û pêşkêşkirin.

Ev xebat ji aliyê çend komên şanoyê ve ku hatine ba hev û dest pê kirine, tê birêvebirin. Ji ber nexweşiya koronayê şanogerên kurd skeçên xwe bê temaşevan dilîzin û ji bo televizyonê tomar dikin.


Me agahiyên der barê xebatê de ji şanoger Yavuz Akkûzû wergirtin. Akkûzû diyar kir ku wan piştî pandemiyê dest bi projeyê kiriye û wiha got: “Beriya dema pandemiyê em 4 komên şanoyê hatibûn ba hev û me biryarek ji bo projeyeke wiha dabû. Piştî pendamiyê jî projeya me ya Hinek Henek wiha dest pê kir; me ji nivîskaran xwest ku skeçan binivîsin û ji me re bişînin. Komên şanoyê yên cihê xwe di vê xebatên de digirin ev in; Koma Şanoya Bajêr a Amedê û Yekta Hêvî ji Amedê, Koma Şanoyê ya Tiyatro Mencel ji Wanê û ji Stenbolê jî koma Teatra Jiyana Nû. Em hatin ba hev û me dest bi vê projeyê kir. Her wiha ev proje ji aliyê Pel Ajansê ve tê kişandin û amadekirin.”

Der barê tevlêbûna nivîskaran de jî şanoger Akkûzû ev tişt got: “Wekî destpêk tevlêbûna nivîskaran a ji bo nivîsîna skeçan jî baş bû. Heta niha derdora 100 skeç ji me re hatine şandin. Ji van 100 skeçan me tenê 50 skeç pejirandin û niha ew tên kişandin.”

Akkûzû di berdewama axaftina xwe de destnîşan kir ku di bernameya yekemîn de 6 skeç hatin pêşandan û niha ji bo bernameya duyemîn 6 skeçên din jî amade ne.

Herî dawî şanoger Akkûzû diyar kir ku mijara skeçan ne destnîşankirî ye û wiha got: “Bi giştî mijarên rojevî yên ji jiyana me ya rojane bêtir bala me dikişînin. Dehênerî jî di navbera 4 hevalên me yê şanoger de tê parvekirin. Bi rengekî hevpar em çar heval vê xebatê dimeşînin.”







# Ferhenga herî mezin a gotinên pêşiyan derket

Navenda Nûçeyan

Berhema nivîskar Mehmet Oncu ya bi navê Gotinên Pêşiyan ku ji 4 cildan pêk tê, ji aliyê weşanxaneya Sîtavê ve di cotmeha 2020’an de hate weşandin.

Edîtorê weşanxaneya Sîtavê nivîskar Qahir Bateyî der barê vê berhemê de axivî û wiha got: “Ev berhem, ferhenga herî mezin û berfireh a gotinên pêşiyan e. 50 hezar gotinên pêşiyan di vê berhemê de cih digirin. Ji vana nêzî 30 hezar gotin, ji hêla nivîskar (berhevkar) ve ji qadê hatine berhevkirin. Berhem ji 4 cildan pêk tê. Her cildek di navbera hezer û 214 û hezar û 248 rûpelan de ye.”

Bateyî diyar kir ku gotinên pêşiyan li gor beşên wan beş bi beş ji hev hatine cudakirin û wiha axivî: “Bi giştî ji 235 beşan pêk tê. Mînak: Gotinên pêşiyan ên li ser jinan, gotinên pêşiyan yên li ser mîrxasiyê, gotinên pêşiyan ên qencî û xerabiyê û hwd.”

Di vê berhemê de zêdetirî 2 hezar çîrokên gotinên pêşiyan hene. Her wiha zêdetirî 4 hezar peyvên ku zêde nayên zanîn an jî di ferhengan de cih nagirin bi dîpnotan hatine şîrovekirin.

Ev berhema ku ji aliyê nivîskar Mehmet Oncu ve hatiye amadekirin, Serwet Deniz û Qahir Bateyî edîtoriya wê kirine.

xwebûn

19-25 Cotmeh 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 44

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Kadri Esen
**Sorumlu Yazışleri Müdürü:** İdris Gürmez
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 **Yenişehir / Diyarbakır**
**Baskı:** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
Tel:0 (541) 806 84 85

DOSYA1: Qewmê li pey azadî, nasname û zimanê xwe; amazîgh ango berberî



Ardîn Dîren

Di destpêka salên 1830'yî de dewleta Osmanî li hember fransiziyan nikare li ber xwe bide û fransizî tên li axa Cezayîrê bi cih dibin ango ew dixin bin serweriya xwe. Bêguman ev sedsal sedsala lêgerîna çavkaniyên aboriyê ye; destpêka kapîtalîzmê û ya mêtingeriyê ye. Fransa jî bi vê hincetê çavsoriyê dike û berê xwe dide Cezayîrê






# Welatekî di bin simên mêtingeriyê de perçiqî: Cezayîr!

Em di serî de qala çîrokekê bikin û wiha dest pê bikin:

***"Serok û wezîrên cezayîrî bi balefirekê ji peytextê diçin bajarekî din ê Cezayîrê. Piştî balafir ber bi asîman ve bilind dibe, wezîrek ji berîka xwe sed dînarî derdixe davêje xwarê û wiha dibêje, 'Ez bi vî sed dînarî kesekî cezayîrî bextewar dikim.' Wezîrek din jî heman tiştî dike û dibêje, 'Kî vî sed dînarî bibîne, ew ê bextewar bibe.' Hemû wezîrên di balafirê de heman tiştî û gotinê dikin. Di dawiyê de pîlotê balafirê xwe nagire, deriyê balafirê vedike û hemû wezîran yek bi yek davêje xwarê û wiha dibêje, 'Ez dixwazim bi milyonan cezayîrî bextewar bikim.' "***

Ez bawer im li vî welatî çiqas nivîs werin nivîsandin jî ew ê weke vê çîrokê bandora xwe nîşan nedin. Bi kurt û kurmancî, ev çîrok rewşa Cezayîrê ya piştî rizgariyê û her wiha nêrîna qure ya serdest a li hemberî gel bi awakî sosret vedibêje.

Dixwazim bi desîsa vê çîrokê qala vî welatî bikim. Serpêhatiya vî welatî ji me gelekan re ew ê nas û nêz were. Weke tê zanîn, li dinyayê gelek qewm û civak hene pir dişibin hev. Ew her çiqas ji hev dûr û di navbera wan de parzemîn, behr û çiya hebin jî xwedî gelek tiştên hevpar in ango dişibin hev û heman pêvajo jiyane. Bi çand, ziman û dîroka xwe; bi pêvajoyên siyasî û her wiha bi şoreş û têkoşînên xwe di heman cihokan de herikîne. Bêguman Cezayîr jî yek ji wan welatan e ku di sedsala çûyî de xwedî gelek arîşe û serpêhatiyên sosret e. Cezayîr: rabirdûyeke biêş a di bin simên dagirkeriyê de û piştî şoreşeke beravêtî dahatûyeke ji rabirdûya xwe dijwartir!

Belê Cezayîr, yek ji wan welatên Mexrîbê yên li bakurê parzemîna Afrîkayê ye ku di navbera Fas û Tunusê de ye. Me gelekan ev nav ji dûr ve bihîstiye û kêm zêde şoreşa wan a li hember fransiziyan şopandiye û xwendiye. Ji ciyekî dûr ji dîrokeke nêz, ez ê hewl bidim qala welatekî û serpêhatiyên wî bikim.

Beriya fransizî werin axa Cezayîrê dagir bikin, Cezayîr di bin serweriya dewleta Osmanî de ye. Heger mirov here beriya Osmaniyan jî ew di bin serweriya ereban de maye û roj bi roj hatiye bişaftin. Loma jî afrîkayî ne tenê afrîkî, ereb, xiristiyan û ne jî îslamî ne; bi reng, çand, ziman û dîroka xwe afrîkî ne bêyî ku bi nasnameyek din werin pênasekirin. Çîroka vî welatê bi salan hatiye dagirkirin û bişaftin, mixabin kûr û dûr e. Em tenê zanibin ku ew ji sedsala 7'emîn heya şerê neteweyî yê rizgariyê di bin serweriya biyaniyan de wek mêtingehek maye û piştî şoreşê jî bi rengekî cudatir mêtingehî her berdewam bûye heya roja me ya îro.

Di destpêka salên 1830'yî de dewleta Osmanî li hember fransiziyan nikare li ber xwe bide û fransizî tên li axa Cezayîrê bi cih dibin ango ew dixin bin serweriya xwe. Bêguman ev sedsal sedsala lêgerîna çavkaniyên aboriyê ye; destpêka kapîtalîzmê û ya mêtingeriyê ye. Fransa jî bi vê hincetê çavsoriyê dike û berê xwe dide Cezayîrê. Helbet ev dagirkirin bi carekê pêk nayê, hê wê demê li hember fransiziyan serhildan dest pê dikin û nêzî 15 salan ev şer didome. Yek ji van kesan jî kesê bi navê Emîr Abdelkader e ku pêşengiya serhildanê dike. Mixabin piştî şer û pevçûnan Fransa bi ser dikeve û serhildan têk diçin. Bi vî awayî çîroka fransiziyan li Cezayîrê dest pê dike.

Ev çîrok çîrokeke bijan e, weke hemû welatên bûne mêtingeh; bi milyonan mirov tên kuştin û komkujî pêk tên di vê pêvajoya dirêj a mêtingeriyê de. Dewleta herî pêşketî ya Ewropayê, rûyê geş û ronîbûna cîhanê ku bi ronakbîr û rewşenbîriya xwe tê nasîn, mixabin xwedî dîrokeke kirêt e. Her çiqas nivîskar û rewşenbîrên Fransayê li hember komkujiyan derketibin û piştgirî dabin şerê Cezayîrê jî dîsa ew xwe ji vê dîroka kirêt nikarin xelas bikin. Weke tê zanîn ne gunehê carekê û rojekê ye, gunehê sedan salan û êrîşên dijmirovahî hene. Mirov bi hêsanî dikare bibêje ku Fransa bi çavkaniyên Cezayîrê aboriya xwe saz kiriye ango xwe kiriye Fransa! Heger mirov bi her alî baş lê bikole wê ev rastî derkeve holê û dîroka mêtingeriyê jî bêtir zelal bibe.

Bêguman li gelek welatên afrîkî çîrokên wisa hene lê ya Fransayê mînaka herî dijwar e. Li ber çavê dinyayê roj bi roj ev tişt qewimîn lê ji ber berjewendiyên xwe tu welat dengê xwe nekir û komkujiyên Fransayê şermezar nekir lê heya û rûmet hebû, heta cihekî helbet... Ew ê dîsa ji bo rûmetê û serxwebûnê serhildan xwe nîşan bidana. Vê carê wê Fransa piştî têkçûnê pişta stûyê xwe bixwiranda û vegeriyaya mala xwe! Her çiqas bi temamî nebe jî ji ber ku piştî şerê rizgariya neteweyî jî rihê Fransayê her li dar bû, kesên di şerê rizgariya neteweyî de cih girtibûn ew ê xwe bişibandana desthilatdarê xwe û ew teqlîd bikirana. Çîroka dijwartir û sosrettir ev bû. Mixabin.

Hêviyên şoreşê û rizgariyê çawa pûç dibin? Hêz û desthilatdarî mirov çawa diguherîne? Mirov piştî serkeftinê çawa dikare bişibe ew tiştê ku bi salan li hember şer kiriye? Di serpêhatiya Cezayîrê de ev yek giş hene û mirov baş dibîne ku piştî rizgariyê jiyan hey zehmettir dibe; gava berjewendî xwe li mirovan dipêçin mirov çawa roj bi roj kirêt dibe û dibe zilimkar... ez ê hewl bidim qala vê rewşê bikim.

**Ber bi şerê rizgariya neteweyî ve!**

Destpêka salên 1900'î tê zanîn ku li cîhanê her netewe dixwest xwe ji bindestiyê rizgar bike û ji xwe re netewe-dewletekê ava bike. Di van salan de li dinyayê qeyranên siyasî û pêre jî qeyranên aboriyê yên dijwar hebûn. Lêgerîna çavkaniyên aboriyê dibû sedema arîşeyên mezin. Her welat dixwest sînorên xwe yên heyî û her wiha hêza mêtingeriya xwe bêtir mayînde bike. Ji ber vê yekê jî di sedsala 20'an de du şerên cîhanê yên qerase qewimîn. Mêtingeriya Ewropayê bi taybetî li welatên Afrîkayê belav bûbû. Li Cezayîrê jî serdestiya fransiziyan hin bi hin sist dibû. Mêtingeriya Fransayê li welatên **Kamboçya** û **Vîetnamê** bi derbên re giran rû bi rû mabû û di dawiyê de li Hindistan û Çînê têk çûbû. Diviyabû Cezayîr ji dest neçe, ji zora xwe ya li ser Cezayîrê hinek din pêşda birin û bi tundî êrîşî Cezayîrê kirin. Diviyabû Cezayîr ji dest neçe, ji ber wê kaniya wan biçikiya û aboriya wan serobino bibûya. Roj bi roj îşkence, qetlîamên komî, zilm û zordarî zêdetir bûn. Di vê pêvajoyê de li Fransayê nêzî şeş hikûmet hatin guhertin. Li welatê Cezayîrê nêzî milyonek mirov jiyana xwe ji dest da. Êdî kêr gihabû hestî. Ev kuştin û qetlîam rê li ber şerê rizgariya neteweyî vekir û di dawiyê de rêxistina **FLN (Eniya Rizgariya Neteweyî)** hat damezirandin.

Me li jor jî got, heya sala 1962'yan gelek arîşe, kuştin û qetlîam çêdibin. Tiştekî girîng heye ku fransizî ji kesên herêmê ango ji cezayîriyan komeke bi navê **"Harkîs"** ava dikin ku pir dişibe pergala cerdevaniyê. **"Harkîs"** ji bo fransiziyan sixûriyê dike. Mirov dikare bibêje ku gelek qetlîamên mezin bi destê van kesan hatine kirin. Piştî rizgariyê ev kes jî bi fransiziyan re koç dikin Fransayê lê mixabin li wir tev ji xizanî û birçîbûnê telef dibin û kes qîmetê nade wan! Dîsa rêxistinên kontgerîla yên wek **OAS (Rêxistina Artêşa Nepen)** ji hêla kesên dixwazin Cezayîr wek Fransayê bimîne tê damezirandin û ev rêxistin dibe sedema kuştina gelek kesan. Heta carekê hewl didin ku generalê fransizî **De Gaulle** jî bikujin lê bi ser nakevin. Ev rêxistin piştî rizgariya Cezayîrê jî heya demeke dirêj xwedî bandor bûye û êrîşên xwe domandine. Di vê navberê de li her aliyê cîhanê ji bo Cezayîrê xwepêşandan tên lidarxistin. Her diçe Fransa di bin vî sûcî de dieciqe û li hember dinyayê şermeke mezin dijî. Herî dawî di navbera FLN'ê û hikûmeta Fransayê de **Peymana Evian** çêdibe û piştî 132 salan Cezayîr ji bindestiyê rizgar dibe û Fransa ji axa Cezayîrê derdikeve lê azmûn hîn nû dest pê dike ji bo FLN'ê û cezayîriyan. Birêvebirina şoreşê wê ne hêsan be û rizgarî bi xwe re gelek nakokî û şerên navxweyî bîne. ***(didome)***

## Damezirandina eniya FLN'ê

Di 1954'an de bi pêşengiya kesên wek **Hocine Ait-Ahmed, Ahmed Ben Bella û Muhammed Boudiaf** eniya FLN'ê tê damezirandin û biryar tê girtin ku şerê çekdarî were destpêkirin. Bi vî awayî li Cezayîrê serhildan dest pê dike. Ev enî ango rêxistina FLN'ê her diçe firehtir dibe û tevlîbûn xurttir dibe. Êrîşên çekdarî, berxwedan û têkoşîn li her dera Cezayîrê belav dibe lê wek her şoreşê, enî û partiya FLN'ê jî di nav xwe de xwedî gelek nakokiyan e û kesên ew bi rê ve dibin li hev nakin. Sala 1956'an Fransa balafira ku pêşengên FLN'ê tê de ne li Tunusê tîne xwarê û gelek pêşengên FLN'ê dîl digire. Hocine Ait-Ahmed ku ew jî yek ji wan kesên tê girtin e, ji bo vê bûyerê wiha dibêje:

***"Di 1956'an de, em ji hev dûr ketibûn û nîqaşên mezin di navbera me de hebûn. Ev nîqaşên me, heya veqetandin û şerê navxweyî jî domiyan lê ev girtin û dîlbûn gihîşt me. Hemû hêzên me nêzî hev bûn û bi hev re tevgeriyan. Kemîna dijminê me, em ji şerê navxweyî xelas kirin û yekitiya me xurttir kir." Ev pêşengên rêxistina FLN'ê heta rizgariyê li girtîgehên Fransayê dîl dimînin.***